

Xweziliya min li te jinê

Jiyana zozanan jî dîtîbû, bêrvantî jî kiribû. Xêzên ji qer-mîçên rûyê wê emrê wê jî geşedana dilê wê jî nîşan dida! Moriyên di stûyê wê de ne şewê ji wan rojan bûn! Lê belê hîn jî gerdeniya wê ne bê morî bû. Bi çend rêzik heqîq û mircanan ve xemilandî bû... **Gula Almastê / R.2**



Çarşema Serê Zîpa

Ziyareta Girkûvî ya li navçeya Farqînê ya Amedê, navê xwe ji gir û sewalê kovî digire ku ji aliyê Şêx Mihemedê ve li ser gir hatine xwedîkirin. Bi munasebata Çarşema Serê Zîpa her sal bi hezaran kes ji Amed, Farqîn, Sason û Hezoyê berê xwe didin ser ziyaretê û mirazên xwe ji ziyaretê dikin... **R.11**



xwebûn

15-21 ADAR 2021 HEJMAR: 65 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org



Kurdan bi hêzbûnê bersiv da komkujiyê

33 sal berê angû di 16'ê adara 1988'an de li ber çavên cîhanê bi bombeyên kîmyewî li bajarê Helebçeyê komkujiyek bi destê Seddam Hiseyîn hat kirin û ji her temenî 5 hezar kurd hatin qetilkirin. Der barê komkujiyê Helebçeyê de bi sedan berhem hatin nivîsin û bi dehan belgefilm hatin çêkirin. Necmettin Salaz jî yek ji wan kesan e ku têkildarî komkujiyê Helebçeyê pirtûka bi navê 'Hîroşîmaya Rojhilata Navîn' nivîsand. Salaz têkildarî salvegera komkujiyê Helebçeyê jî rojnameya

me re axivî û wiha got: "Piştî Helebçeyê hê jî komkujiyên li ser kurdan didomin. Ji destê wan were heta ku yek kurd bimîne dê wan tune bikin lê helbet ji destê wan nayê. Ji ber ku kurdan xwe birêxistin kiriye." Salaz da zanîn ku li gorî qanûnên navneteweyî kurd bi komkujiyên re rû bi rû ne lê tiştên tîn serê kurdan wek komkujî nayên pênasekirin û ger wisa were pênasekirin neçar in wê civakê biparêzin lê beriya her tiştî pênase nayê kirin... **R.7**

Werger çî ye?

Piştî ku romana Sûc û Ceza ya Dostoyevskî hat wergerandin, kovara Popkurdê meseleya wergara wergerê/wergera ji zimanê duyem kolan û ji wergêran pirsî. Tiştê min jê baş fêhm kir ev e: Heta derfet hebin, berhem divê ji zimanê esasî bîn wergerandin. Jixwe ji ber ku heta îro derfet tunebûne, ev berhem piştî sed û pêncî salan ji zimanê duyem hatiye wergerandin. Hewce nake mirov wê yekê bêje. Ya min jê fêhm nekir jî ev e: Çawa wergereke ji zimanê duyem, esas ji tirkî, "zîrarê dide zimên". Ev ne zelal e. Di nav van nîqaşan de ez li bersiva wê pirs geriyar: Gelo wî zîlamî pirtûk çawa wergerandiye?... **Takî Çiftsûren / R.5**

Newroz banga yekitiyê ye

Newroz li bakurê Kurdistanê dê li 30 bajar û 61 navçeyan were pîrozkirin. Tifaqa Kurdistanî li Amedê bi daxuyaniyê deklarasyona Newrozê aşkera kir. Agirê Newrozê dê ji bo geşkirina yekitiya neteweyî û şermezarkirina tecrîdê were gurkirin. Endamên tifaqê destnîşan kirin ku dê bi agirê Newrozê yekitiya neteweyî xurt bikin û tecrîdê ji holê rakin... **R.3**

Agir tim li ba me pîroz bû

"Newroza Siltanî Toqmaqê xwe hilda hanî Bihar û zivistan ji hev deranî" Li gorî vegotina Şaşayê Apê min; evara Newrozê li ser xaniyan agir tîn vêxistin, dora êgir, serê şeniyan malê yek kevirên sêl (pehn) tîn danîn. Her kes kevirê xwe nas dike. Sibetirê li binê keviran mêze dikin, di binê kevirê kê de bihok (kêzik) hebin, qeder û qismet li serê wan e. Dîsa di serê daran de qutikên teneke dikutin, hundirên wan tîjî xweliya sobê dikin, niftê hirdişin ser û êgir berdîdîne. Di destê her kesî de ji wan yek, du çira, di nav gund de dimeşin. Şaşa digot: "Di zarokatiya min de ji şevên gund yê herî xweş ew şevên Newrozan bûn. Ji aliyekî ve li ser xaniyan agir vêdiket û ji alî din ve jî di destên me de çira, me stran digotin û em dimeşiyar." Halbûkî agir tim li ba me pîroz bû...

Ayhan Erkmen / R.8




Şerê hişê mirovan û yê çêkirî

Ji nişka ve telefona te kilit dibe û naxebite. Ne dikarî telefon bikî, ne dikarî internetê bi kar bîni û ne jî dikarî agahiyên tê de kombûyî bi kar bîni. Her wiha interneta malê jî qut dibe û telefon an jî kompûterên li malê yê din jî nikarî bi kar bîni. Destê te bi kîjan amûra elektronîkê dikeve, yan jî gava dengê te dibihê her tişt erka xwe betal dike. Ji ber neçarî dixwazî biçî kar û tengasiyan li wir hel bikî. Lê bi awayekî elektronîk erebe venabe, bi kîlta destan vedikî, lê wê carê jî erebe bixwe naxebite. Zeman ne-maye û dixwazî bi otobêsa navbajêr bi rê bikevî. Gava şênî lê siwar dibe... **Ehmed Pelda / R.6**

'AMIDA' ya bi latînî

Wekî tê zanîn, delîla ji bo navê "Amîd/Amîda" yê tê pêşkêşkirin çavkaniyên Romayê ne. Tê gotin ku dewleta Romayê pereyekî ku li ser "Amîd" nivîsandî çap kiriye û her wiha diroknivîsê romayî yê ji Antaqayê Ammianus Marcellinus (330-391 P.Z.) di pirtûka xwe de navê bajêr wekî "AMIDA" nivîsandîye. Lê gelo "i" ya "Amida" yê bi zimanê latînî wekî "i" ya tirkî û "î" ya kurdî tê xwendin?... **Amed Çeko Jiyar / R.12**



Romana kurdî tune ye!

Helbestvan Taha Xelîl pirsên rojnameya me bersivandin û got ku romana kurdî tune ye lê çend romanên kurdî hene û hinek kes hene ku dema kurdwan wekî romannivîs bibînin jixwe ew tofana... **R.4**

Li Şengalê kî çî dixwaze?

Di dema derbasbûyî de, serkêşên dewleta tirk îtiraf kirin ku ew zorê li hikûmeta Bexda û PDK'ê dikin ku şertên Peymana 9'ê Cotmehê ya di derheqê Şengalê de pêk bînin. Di peymanê de tê gotin ku divê Asayîşa Êzîdxanê çekên xwe deyne û dawî li xebatên xwe yê parastina gelê herêmê bîne. Her wiha li gorî peymanê divê sazîyên Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê jî xebatên xwe

yên rêxistinkirina gel bi dawî bike û divê sazîyên di bin rêvebiriya meclisê de ne dewrî hikûmeta Bexdayê bînin kirin. Bêguman ew zext û zordariya dewleta tirk, rasterast destwerdana karê navxweyî yê Iraqê ye. Di qada navneteweyî de ev sûc e. Li gorî hêzên metinger û hevkar mafê civakê êzîdî nîne ku xwe bi rêxistin bike û xwe biparêze. Tirs wan ev e. Ji bo îradeya ku... **Felemez Ulug / R.6**

Hetiketiya melayê gund

Rojekê melayekî li pêşiya cemaetê qame digire, nimêj dike, gava ku xwe qusê erdê dike diçe secdê, zor pê dikeve bayek ji ber diçe. Mela gelek li ber xwe dikeve, ji şerman diçe rûyê wî dikeve binê erdê. Piştî ku cemaet belav dibe, bi lez û bez diçe mala xwe ji wî gundî bar dike, diçe gundekî dîr. Sal û zeman di ser re derbas dibin. Pir bêriya gundê xwe dike, rojekê xwe bi xwe dibêje: Ez ê biçim gundê xwe, gelek sal derbas bûn, niha wan tira min ji bîr kiriye. Radibe tevdira xwe dike berê xwe dide rê bi ber gundê xwe ve diçe, gava digihîje nêzî gund rastî... **R.10**

Xweziliya min li te jinê û wê hezkirinê!

Gula Almastê

Ji we çend kes ji nav nivînên xwe bi strana “tu bi hêlîna van tîtiyan” re şiyar-bûne, nizanîm. Heke dil tenik be, mejî xew re biçê jî hiş melodiyan xwe dihûne! Ev bîsteke hêviyan min deng vedane ez her sibe stranên tîtiyan û qeb-qebên kewan bi dengê bilbilan şiyar dibim. Mirov ji xwe re dibêje ev dengê dilê min e gelo ji min re dipeyve! An jî ew dengên ez pê şiyar dibim dikarim bêjim ji sedî sed ez mirim, vaye ev der jî bihuşt e. Ew a zingînî ji hişê min tîne, ez bi ser xwe ve tîm jî dengê dîk e ew her sibe li ber guhê min dijene!

Serê sibê saet hê şeş û niv bû ez ra-hêjtîm destika pencerê; bizanibin ku li bihara Serhedê roj xwe di saet çarê sibê de hiltîne! Çawa min pencere vekir, bêhna pûng û cehtiriyê li ber bêvila min xist kezêb û pişika min di hinavê min de bi hev re şabûn. Min dît xaltika fincanê tepsîkek di dest de, pînekî spî avêtiye ser, di destê din de jî demliga çayê kubar kubar dimilmile. Dengê min, rê li wê birî; “Xaltîkê tu bi ku ve diçî?” Xaltîka fincanê bi awirên çavan nişan da hêla ku apê Simko lê bû. Got; “Apê te xurîniyê bi cixarê dike! Ez pir li ber dikevim, ji ber wê ye ez jê re taştê dibim, dayîkê! De ka tu ji were tevî me çayê vexwe!” Ez ji wê re bişirîm, wê sermilk li xwe hilçîni, ne ji fediyên bû ew tevgera wê ji hezkirin û dil li ber derneketinê bû. Got; “Çi bikim! Ne îro, vaye pêncî sal derbas bûn ez hema wiha li pey wî pêge me!” Du wê vexwendinê ez qet disekinim, mehnî li min xweş bû! Min rahêjtî şimikan, min şirpandê pahniyan!

Ez gihîştîm ba wan, em rûniştin me çong li hev kutan. Sohbet geş bû li ser sînga şîn a deşta zozanê Serhedê! Emrê wan li ser hefteyê bû devî devî heştêyî dikir, lê çiqas dîsa ji emrê wan bibihure êdî ne xema wan bû! Xaltîka Fincanê berê pirsên min da apê Simko! Xaltîkê wekî rêzgirtinekê dora peyva ewilî da wî. Apê Simko jî qala xwe nekir, bi pesnê Fincanê rê da axaftina xwe! Got; “Mala te jinê! Ne weke xwe ya niha bû. Tu bawerke heke Edûla Derwêş hay jê hebûya wê teqez dexesî li wê bejnûbal û bedewbûna wê bikira!” Peyvî li xeber-

dana xwe sar nekir. Çavên xwe kuskusand duredur rêzefilma serpêhatiyên xwe nêrî, ji nav re çend kêliyên bi jîr bûn û jêhatîbûna berdilka xwe jibart û domand; “Du sed pez di du saeta de didot û of jî nedigot! Niha jî nikare du çêlekan bidoşe! Hey wax li min û wan rojan!” Gulmek ji cixareya xwe ya pêçayî xist, duyê wê bera valahiyê da, mîna rojên borî bela bû li valahiya zemên de winda bû.

Dibe ew dem ji min re xêlek e bi kalamên xweş ve xemilandî bû, lê ewa ji dirûvê wê dijîjûya ne çirkek bû wê bi firtekê bi lêv bikira. Ji emrekî tîr û tîje bûyer, bi qewimiyên ol û eşîran ve dagirtî bû. Ne tenê çirokeke dilê wê bû. Ewa min dixwest ji min re qalê bikin! Bûyereke xêr an jî ne bixêr, heke biqewime hemî neferên malbatê û civaka wan jî bêguman di bin bandora wê de diman û dimînin. Li ser serpêhatiyên wiha gelek destan, çirok û stran jî hatine honandin! Du dilê bixwestina ew xwe bigihînin hev, heke pêk hatina wê ne mimkun ba wan dest didane hev xwe davetin ber bextê xêrxwazan! Her çiqas ne bi dilê civakê be jî lê revandina keçan tîştêkî ne dîrî edetan bû. Gelek caran jinê bi mêr û bi zarok jî bi destê zordariyê hatine revandin! Carna jî her çiqas ne zêde be jî jin jî diçin li ser malan! Navê wê bûyerê jî li ser yekî rûniştin e! Lê çiroka xaltîka Fincanê hinekî şêrane ye! Ka hela em guh bidin! Kê û kê revandiyê?

Xaltîka Fincanê berdewam kir: “Gotin li gundê me dawet heyê! Ez jî nû gihîştîme, dilê min pirtepert e lê nahêlin ez herim dawetê. Dibêjin tu yê berbiçavî wê te birevînin. Ez jî çawan im zani” bi bêhneke kurt navber da axaftina xwe. Çavên min ên li pey şopa bûyerên ciwaniya wê ketibûn, hemû hesret di bibikan de dixwendin! Wê berdewam kir: “Bi xwedê heq ez çira me, vêdikevim! Ez difikirim! Li min hewara xwedê ez ê çawa bikim ku biçim dawetê! Min, dêrê qutinî yê bi gulên sor ve xemilî li xwe kiriye, rêzek şewê min jî di stûyê min de, di navê de jî serdîlkek heyê! Dora wê serdîlkê jî bi zîv ve çêkirî ye. Bavê min ew gerdenî ji min re li Erzîromê dabû girêdan. Hingî roja bavê min ew gerdenî ji min re anîbû; min kiribû stûyê xwe, min mîna çavên



xwe jî ew xweyî kiribû û nedabû tu kesî û winda jî nekiribû!” Got û destê xwe bê hemdê xwe bir ser moriyên li ber gerdena xwe ku wê gerdena xwe bi pê ve xemilandibû! Lê ew ên wê bi tiliyan ve henûnî mist dida û dihewand ne morî û mircan bûn! Ez bawer im ew bi xwe teva rabîrdiyên ciwaniyê bûn.

Wê domand: “Erê bavê min destûra çûna dawetê neda. Ez walî çûm walî hatim min dî bi minet û ricayê nabe, min xwe ji wî dizî! Erê min debar nekir ez bi dizîka çûm dawetê! Min xwe da refên keçikan, hinekî jî bi paşda ne bi pêş da.” Ew wegeriyabû wan rojan lê kelecana wê ye bi pê serbihuriyên xwe rave dikir hîn jî germ bû. “Min dît xortek di nav govendê de direqise du çav têrê nakin ku tu li wî binêrî! Ne bi lêv ne jî dêv tê şirovekirin! Min pirsî, gotin ne jî gundê me ye, diyar e ew nenas e! Bi wê gavê min ne heft dila, bîstûheft cara dil berdayê! Bi salih û silûhan ez serve bûm kî ye! Min dît sakoyekî reşî li ser çeperê ye jinan jî qun lê qutaye. Gotin sakoyê wî xortî ye. Ez çûm kêleka wî sakoyê xerib rûniştim. Min hêdî hêdî pêşa dêrê xwe avêt ser, ji bo jin li ser sako rûnenên û ew nebe qirêj û ne qirçime! Xortê min xwe bi hejandina dîlanê min bi hewandina sakoyê bi xwedî

kes! Me bi awiran li hev kir çavên me man di bibikên hev de.”

“Roja din destê min di hevîr de, min xengela dibir. Bi hatina keçîka cînarî bo pêdiviyek nav malê, min bihîst xerîbê ji bo min hatiye xuliqîn, mêvanê kê ye! Agiro, kê tu gur kirî? Ez bûm pizot, bi xwe ketim! Gelo yê çawa be, çî rê, çî derfet wê hebe, bifikir! Lêlê dîneê bifikir, ha bisêwirîn! Min şewê xwe ji stûyê xwe derxist kir stûyê keçîka cîran. Min jê re got; ez didim te, îro tu têke stûyê xwe! Ez ê paşê bême, ji te bistînim! Min çengek ar û tasek jî rûnê nivîşk da dest, min got; bibe bila diya te pê hewlê çêbike! Ev jî diyariya min e, bi pêş mizgîniya te ve!

Her çiqas ez dudilî bûm jî ji bo çûna xwe, min nedixwest bavê xwe bihêlim. Qîza ez, bûka ez, wî hê lawên xwe nezewicandine! Ber bi êvarê ve, ez a nif-teya deriyê bavo! Min kupa dilê xwe li ser zirza mala wî xist! Min berê xwe da mirazê yê şevêk û roj danekê!

Dayê ez çî serê te biêşînim tu nabe ew jî fersendê badide û derfet nakeve! Wele lawo, mêrikî çar gurçik bû! Ez jî keçêke mêrane! Bi me re du hesp anîn, me berê xwe da xana li ser rê û çîpên hespên me di nav kurşê berfê de!”

Dema apê Simko qala rojên berê û

serbihuriyên xwe dikir, bi zimanekî zelal û herikîneke bêhempa ji dêv dibariya! Lê mixabin, mijar ku diguherî di hate ser jiyana rojane derba asimilasyonê xwe ji nişka ve di nav de diteqand! Ji ber ku piyekî wî di nav bajar û sûkê de bû. Lê xaltîka Fincanê tu car derfet nedîtibû ji kar û barê xwe yê giran ku ew biçê deverêkê, ji xeynî nexweşiyekê yan jî bi taybetmendiyê bûyereke. Wê qet û qet xwe nedabû ber rêzefilmeke eletewş jî! Zimanê wê ewqas paqij bû mirov dikaribû bigota hevokên wê ji malzaroka diya wê qetiyane û heya wê rojê hatine!

Jiyana zozanê jî dîtibû bêrvantî jî kiribû. Xêzên ji qermiçên rûyê wê emrê wê jî geşedana dilê wê jî nişan dida! Moriyên di stûyê wê de ne şewê ji wan rojan bûn! Lê belê hîn jî gerdeniya wê ne bê morî bû. Bi çend rêzik heqîq û mircanan ve xemilandî bû. Cixara wê ye pêçayî ku wê qalê kiribû; “Roj me hev nasiye vir de lawê Silêmin her tim ji min re mûştê teme kiriye û aniyê!” Cixara xwe di nav tiliyan de bi delaliyekê girtibû wê carcaran dibir ser lewa xwe bi kêfeke ji dil du didayê! Me qala dewlemendiyê jî kir û feqîriyê jî, bi dayîka heft zarokan û şêst û çar nevî û neviçîrkan! Min ji xwe re got; “Xweziliya min li te jinê û bi wê hezkirinê!”

Rizgariya jinan rizgariya civakê ye

Fîdan Tizyanî

Jinbûn, bûyîna herî dijwar a mirovan, îfade dike. Bi hezaran jin her roj bê deng an jî bi qîr û hawar ji nav me diçin. Bêhna sar a mirinê ji ser piştê jinan, laş û giyanê jinan qet kême nabe. Kesayetîya jinan ku ji hemû cureyên mirinê re vekirî tî heştin, tu carî nikare wê bixe navenda ramana jiyânê demdirêj. Ger hûn jiyânê wekî xerckirina demê kin dibînin û paşê jî rawestîn, ew têkoşîneke ne baş e.

Di nav ew qas kirêtiyê de, jin ne dikarin bi rengê rasteqîn bijîn, ne jî kes dikare bi wan jinan re bi rûmet bijî. Heke hûn her gav bi rengê xirab werin vegotin, sedem gelek in ku hûn xwe nizm û kême hîs bikin. Ger heqaret li hemû qadên jiyânê derkeve pêşîya mirov, mirov naxwaze gotinên xweş ji kesî re bibêje. Jina ku wekî ‘ya kesekî din’ diji nikare

xweşkiyê li xwe zêde bike. Jineke ku bi vî rengî nikare di neynikê li xwe mêze bike, nikare ji bo xwe hebe û bibe xwedî giyanê xwe. Ew jin nikare qedrê laşê xwe jî bigire. Jina ku ji hêla pergalê

ve hatiye afirandin, ji bilî xwe ya her kesî ye. Koledariya zayendî tunekirina jinan ji xwe re kiriye şertê pêşîn ê hebûnê.

Xulamîya jinan avaniyêke civakî ye



ku piştê hatiye bipêşxistin, ji tirs û tarîtiyê pêk tê û tu tîkiliya wê rastiyê bi xwezaya jinan re jî tune ye. Jina ku li destê mêran dinihêre, wekî parsekekê ye û di warê aborî de jî xizan e. Ji aliyê rewşenbîrî ve tî seqetkirin û di hemû warên jiyânê de jî nezan tî heştin. Hêza zilaman ku tenê di koletiya jinan de xwe îspat dike, ji qelsiya wan e. Serdestiya xwe ya li ser jinan, ji xwe re wek terapî dibîne û dilê xwe pê rehet dike.

Nasnameyên zayendî yên ku bêyî îrade hatine avakirin, li hemberî wê li ber xwe bidin da ku xwe bi hêza xwedayî jî nû ve biafirînin. Nebûna nasnameyê cezayê herî mezin e ku pergal dide jinan; her wekî efsaneya ku Hawa ji parsûyê Adem hatiye afirandin.

“Dîrok di roja me ya îroyîn de şarî ye û jin di destpêka dîrokê de.” Gava ku em parçeyekî nan li erdê di-

bînin, em wî maç dikin û didin ser serê xwe. Belê nan pîroz e, lê kê ew nan dît; gerek neyê jîbîrkirin. Dixwazin rastîya jinan bidin jîbîrkirin. Divê li dîroka jinan binêrin, ji demên kevnar heya niha çî guheriyê? Tê jîbîrkirin ku endezyarên yekem jin bûn. Dîsa divê neyê jîbîrkirin ku ew jinên ku jê re digotin “cadû” bi-jîşkên destpêkê bûn. Yên ku dîroka mirovahiyê daye destpêkirin, jin in.

Divê jin zihniyeta zilaman a ku wan wek “koleyên bindest, jina pûç, xulama mêrê xwe” dibîne, qebûl nekin. Jin ne cînsê duyemîn (talî) in. Divê jin doza bedena xwe, nasname û keda xwe bikin. Jin ne nivê rojê ye, lê roj bi xwe ye; jin ne nivê civakê ye, lê tevahiya wê ye. Divê hemû jin dîroka xwe bizanibin. Ji ruhê koletiyê, ji bûyîna zayenda duyemîn, ji xweliya serê xwe xilas bibin û divê ew ji yên ku dîroka wan diziye, hesab bipirsin. Ji ber ku rizgariya jinan rizgariya civakê ye.

Agirê Newrozê dê her derê germ bike

Navenda Nûçeyan

Kongreya Civaka Demokratîk (KCD), Partiya Herêmên Demokratîk (DBP), Partiya Demokratîk a Gelan (HDP), Komelê Şoreşgerên Demokratîkên Kurd (DDKD), Partiya Însan û Azadiyê (PÎA), Partiya Komunist a Kurdistan (KKP), Platforma Demokratîkên Kurd (PDK-Bakur), Partiya Demokrata Kurdistan-Tirkiye (PDK-T) û Partiya Azadî yê di Xebata Tifaqa Kurdistanî de cih digirin, têkildarî pilansaziya pîrozbahiyên Newroza 2021'ê li Amedê civiyan û deklarasyona Newrozê aşkera kirin.

Hevserokê KCD'ê Berdan Ozturk, Hevserokên DBP'ê Salîha Aydenîz û Keskin Bayindir, Hevseroka HDP'ê Pervîn Bûldan, Serokê Giştî yê PÎA'yê Mehmet Kamaç, Serokê Giştî yê KKP'ê Sînan Çiftçiyurek, Serokê Giştî yê PDK-T'ê Mehmet Emîn Kardeş, Serokê Giştî yê Partiya Azadî Ayettullah Aştî, nûnerên partiyên siyasî û pêkhateyan beşdarî civînê bûn.

Li salona civînê pankarta dirûşma Newroza îsal "Em bi agirê Newrozê li ber xwe bidin, bi ser bikevin" û her wiha pankartên bi nivîsên "Jin wê bi serhildana xwe agirê Newrozê geş bikin", "Newroz ji bo azadiya gelan doz e, ji bo yekitiya kurdan soz e" û "Agirê Newrozê geş bikin, tecrîdê bişkinin" hatin daliqandin.

Deklarasyon ango daxuyaniya Newrozê ya bi kurdî ji aliyê Serokê Giştî yê PÎA'yê Mehmet Kamaç û ya metna tirkî

Starta Newroza 2021'ê bi daxuyaniyê hat dayîn. Newroz dê li 30 bajar û 61 navçeyan were pîrozkirin û Newroza Amedê dê 21'ê adarê de bê pîrozkirin. Agirê Newrozê dê ji bo geşkirina yekitiya neteweyî û şermezarkirina tecrîdê were gurkirin



ji aliyê Hevseroka Giştî ya DBP'ê Salîha Aydenîz ve hat xwendin. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Em Newroza 2021'ê, di qonaxeke dîrokî de di nav gelek zehmetî û astengiyên de pêşwazî dikin. Di serdema îroyîn de hem li cihanê, hem li Rojhilata Navîn û hem jî li Kurdistanê, alozî her diçe kûrtir dibin, zext û zordariyên Dehaqan zêdetir

dibin. Ew hêz dixwazin gelan bifetisînin û desthilatiya xwe qewî bikin. Ji Efrînê heta Girê Spî, Serêkaniyê û Kerkûkê, ji Rojhilat heta Bakur gelê kurd bi êrişên giran re rû bi rû ye."

Di daxuyaniyê de tecrîd hat şermezarkirin û wiha hat gotin: "Dixwazin hem daxwaza azadiyê ya ku bi ruhê Newrozê re bûye yek, hem jî destketi-

yên gelê kurd ên ku bi têkoşîn û berdelên mezin hatine bidestxistin tune bikin. Tecrîda giran a li ser birêz Ocalan û li tevahiya girtîgehên li ser girtiyên siyasî hatiye ferzkirin, zext û fişarên li ser gelê kurd û zimanê kurdî, êrişên li dijî îrade û hebûna kurdan îro gihîştîye asta herî bilind. Ev tev nişanên înkarkirina gelê kurd in."

Hat gotin ku bêguman Newroz ji bo miletê kurd xwedî wateyek pîroz e û di berdewamiyê de ev tişt hatin bi bîrxistin: "Bi têkoşîna Kawayê hesinkar ala Newrozê digehe asta herî bilind. Newroz roja serhildanê ye li hember zordarî, zilm û her cureyên neheqiyê ye. Ev neheqî ne qedera me ye, ew zilm û zordariya Dehaqan bi gurzê Kawa hat hilweşandin. Her Newroz têkoşîna azadiyê ya miletê kurd bi awayekî xurtir û geştir derdixê holê. Her wiha Newroz diyariya gelê kurd e, ji bo gelên mezlûm ên li cihanê û ji komên bindest re nişaneyê azadiyê ye, nişaneyê dîrokî ya têkoşîna li hember zordarî û neheqiyê ye. Îro li Kurdistanê, politîkayên şer û tunekirina miletê kurd zêdetir dibin. Lê divê em bi rêxistinîbûn û bi biryarbûn, xwe li hember van êrişan her xurt bikin."

Dê bibe Newroza yekitiya kurdan

Nûnerên Xebata Tifaqa Kurdistanî piştî daxuyaniya Newrozê axivîn. Serokê Partiya Komînist a Kurdistanê Sînan Çiftçiyurek jî bal kişand ser girîngiya yekitiyê û wiha got: "Newroz bang e. Ji bo destkeftiyên xwe pêşwazî bikin bang e. Sala 2021'ê ji bo gelê kurd meseleya herî girîng yekîtî ye."

Serokê Partiya Azadî Ayettullah Aştî jî li ser yekitiyê rawestîya û got: "Xweda pîrozbahiya herî mezin a ji mirovan re şandiye Qur-an e. Li gorî ayeta Qur-anê dibêje hemû mirov li

cem xwedê yek in. Divê her tim alîkarî bi mezlûman re bê kirin. Ger ku em îro bixwazin bibin xwedî al, ol û netewe, divê em yekitiyê di nav xwe de ava bikin."

Hevserokê DBP'ê Keskin Bayindir got ku amadekariyên Newrozê temam kirine û wiha bang kir: "Em dixwazin gelê kurd bi cil û bergên xwe bi ruhê xwe li dijî tundiya vîna gelê kurd û bi ruhekî berxwedêr tev li vî Newrozê bibe."

Hevseroka HDP'ê Pervîn Bûldan jî bal kişand ser girîngiya peyama

Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan a Newroza 2013'an û got ku divê dîsa li ruhê Newroza 2013'an vegerin û axivî: "Em hevî dikin ku Newroza 2021'ê li gelê cihanê aştî, aramî û azadiyê bîne. Em di pêvajoyeke wisa de ne ku pêdiviya gelên cihanê bi aştî, azadiyê heye û wê Newrozê pîroz bikin. Sala par ji ber şertên pandemiyê me Newroz pîroz nekir. Lê îsal dîsa em ê şertên pandemiyê li ber çavan bigirin û Newrozê bi coşeke mezin ji bo bibe wesîleya aştî û demokrasîyê pîroz bikin."

Bi hinceta 'zimanê biyanî ye' Xwebûn nedan girtiyan

Midûriyeta Giştî ya Malên Ceza û Ragirtinê ya Wezareta Dadê rojnameya me Xwebûnê ya heftane weşana kurdî dike bi hinceta "zimanê biyanî ye" neda girtiyan

Girtî Abdurrahîm Akalp ê li Girtîgeha Tîpa F a Bolûyê dimîne, ji Alîkarê Hevserokên Giştî yê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) yê ji Rêxistinîkirinê Berpirsîyar û Parlamenterê Der-simê Alîcan Onlu re nameyek li ser mijarê şand û diyar kir ku rayedarên girtîgehê rojnameya Xwebûnê, bi hinceta "zimanê biyanî ye" nedan girtiyan û ketina rojnameyê ya girtîgehê qedexe kirin.

Akalp di nameya ku ji Onlu re şand de wiha got: "Zimanê me 40 milyon kurdan weke 'zimanê biyanî' dibînin. Ev nayê qebûlîkirin. Me biryara rêve-beriya Girtîgeha Tîpa F a Bolûyê

gîlî kir. Der barê biryara qedexekirina rojnameya Xwebûnê de bersiva ku 'kovar û rojnameyên zimanê wan biyanî ye nagirin girtîgeh' dan me. Li ser mijarê me ji Midûriyeta Giştî ya Malên Ceza û Ragirtinê ya

Wezaretê Dadê re nivîs şand, lê midûriyete destûr neda ku rojnameya Xwebûnê teslîmî girtiyan bê kirin. Rojnameya ku ji me re hatibû şandin ji bo ku li malbatan vegerînin kirin depoya girtîgehê." **AMED**



Zrîngê got; 'Bijî Newroz'


Navenda Nûçeyan

Kovara mîzahê Zrîng ku mehane weşanê dike, di hejmarê xwe ya meha adarê de cih da Newrozê. Di berga kovarê de nivîsa 'Bijî Newroz' cih digire û 2 kes bi lastîkan agirê Newrozê pê dixin û dibêjin dê tekerekê jî ji bo yên hundir pêxin.

Kovara Zrîngê bi hejmarê 12'emîn gi-hîşt xwendevanên xwe. Kovar ji sedî sed kurmançî weşanê dike û di kovarê de xêz û nivîsên mîzahî cih digirin. Di vî hejmarê de xêzên; Rûşen, Eşref Mûmcû, Mustafa Yaman, Erceren, Kubîlay Odabaş, Hebûn, Michael Erdman xêz kirine û xêzeke ku ji girtîgehê hatiye şandin hatiye dayîn.

Di kovarê de Azad Kutî bi nivîsa 'Meselokên Me', Şêx Zübêr bi nivîsa 'Helal û Heram', Îkrâm Balekanî bi nivîsa 'Jin&Mêr', Ozgur Amed bi nivîsa 'Leopar Ferhat û evîneke çînî...', Usiv Mele bi nivîsa 'Teşqele', Mem Aliyê Kamûr bi nivîsa 'Roja we pîroz be!', Eliyê Xemxwîr

bi nivîsa 'Ma ev jî henek e', Îsa Bal bi nivîsa 'Feqiyê Xeberbêj' rengî dane kovarê. Kovarê vê mehê jî ji bo xwendevanên xwe pêşbirka zanyarî, çand û wê-jeyê amade kiriye û her wiha encama pêşbirka meha borî di kovarê de hatiye ragihandin. Li aliyê din di rûpela dawîn de portreya Qazî Mihemed hatiye xêzkirin û kurtejiyana wî hatiye vegotin.



Stran hat amadekirin

Ji bo Newrozê ku dê li 30 bajêr û 61 navçeyan bê pîrozkirin, danasîna strana ku ji bo Newrozê hatiye gotin û klîba wê jî hat çêkirin. Gotinên stranê yê Mihemedê Pirozî ne. Hunermend Dîlan Yîgît, Jiyan Savci, Cejna Sarûhan, Kadîr Çat, Ûmût Botan, Mûrat Bakrak, Devrîm Ozluk, Mêrxas Vîyan û Merve Admîş distrên.

Gotinên strana "Dîsa li Newroza" wiha ye:

"Bipirsin ji dilê dîrokê
Ji demsalan ji şev û rokê
Ji hespê xwîn giha çokê
Da rastiyê danê ser kokê

Newroz neyara tariyê ye
Tîra ser singa şevê ye
Bo zalim hesta revê ye
Soza li ser eniyê ye

Sed caran mizgînî, dîsa ducanî ye
xweza
Nişê Rustemê Mezin li vê axê nû za
Bi şîrê xwe mêjand Hurema maka
Zagrosa
Vînek ji agir gur bû dîsa li Newroza

Hatin Kawayê her demê
Pêlek ji bayê serdemê
Weke Sûr û Dimdimê
Ketin govend û semê

Zivirî ew çerxa felek
Wek hezar salan carek
Dem dema ceng û tolek
Kurd li dor Rojê bûn xelek

Sed caran mizgînî, dîsa ducanî ye
xweza
Nişê Rustemê Mezin li vê axê nû za
Bi şîrê xwe mêjand Hurema maka
Zagrosa
Vînek ji agir gur bû dîsa li Newroza"

HELBEST NEMA DIKARIN HENEKÊ XWE BI XELKÊ BIKIN Romana kurdî tune ye!

■ Rizoyê Xerzî

Vê hefteyê jî dîsa berê me li Rojavayê dil bû. Me xwest ku em nivîskarekî din bikin mēvanê we hêjayan da ku hûn ji nêz ve wî nas bikin. Ez behsa nivîskar Taha Xelîl dikim ku di rêwîtiya wî ya nivîs û wêjeyê de gelek bîr, bawerî û nêrînên cuda di tûrikê wî de hatine ser hev. Me ev hevpeyvîn, bi helbestvan, nivîskar û rojnameger Taha Xelîl re li ser nivîs û wêjeya kurdî kir.

Di di destpêka salên 90'î û çend salên beriya wê de, tevî hemû qedexeyan tevgera mezin a çandî hebû, bi taybetî li Heleb û Şamê. Wê gavê meyla te jî li ser erebî bû, tu dikarî hinekî behsa wê demê bikî?

Di wan deman de, tu çavkaniyên kurdî ku em weke nivîskar jê têr bibin tune bûn û çend pirtûkên li vir û wir nikarîbûn bala me bikişînin ser xwe lê bi erebî her û her gelek bûn. Em jî li wan bajaran di nav tevgera wêjeyî ya erebî de bûn û me xwe tê de didît. Ne tenê wilo alav û derfetên belavkirin û weşanê jî hebûn û dema me bi zimanê erebî jî nivîsand, me ji gelek nivîskarên ereb kûrtir û bi watetir dinivîsand. Me jî hêdî hêdî xwe di wê riyê de dît û em pê de çûn. Ji aliyekî din ve nivîsandina me ya bi zimanê erebî carinan ji bo me wekî azmûneke wêjeyî bû.

Gelek kurd hîna jî bi zimanê erebî berhemên xwe dinivîsin. Sedema vê yeke çi ye û gelo ew berhem dibin malê kurdan an jî malê zimanê ku pê tê nivîsandin?

Ev mesele dûvedirêj û bi nakok e. Bi rastî ne tenê li cem me, li gelek welatên bindest û dagirkirî ev mijar cihê guftûgoyan bû, mîna welatê Cezayir û Mexrib. Wan jî ev pirs dikir lê li gorî min mesele ne tenê ziman, nasnameya nivîskar a wêjeyê dide nasîn. Wekî mînak, hin kes bi zimanê kurdî dinivîsin lê ez wan wekî nivîskarên kurd nabînim, ji ber weke turîstekî li tiştan dinêrin û dinirxînin, tenê derve dibînin û pesnê tiştên dî-tîne dîde. Hinek din hene, bi zimanê biyanî dinivîsin lê ruh û can û hundir û mijar tev kurdî ye. Ez ê çawa bêjim ev berhem ne kurdî ye? Li ba min wek mînak jî ez ê tiştêkî din bînim ziman: Selîm Berekat û Yaşar Kemal her du ne bi zimanê xwe dinivîsînin lê wêjeya Selîm kurdî ye lê ya Yaşar na. Ji ber mesele ku min berî niha got, mesele ew e ku tu bi çi çav û dilî dinêrî û dinivîsî.

Ez li berhemên Yılmaz Güney jî



Wekî mînak, hin kes bi zimanê kurdî dinivîsin lê ez wan wekî nivîskarên kurd nabînim, ji ber weke turîstekî tenê derve dibînin. Hinek din hene, ne bi kurdî dinivîsin lê ruh û can û hundir û mijar tev kurdî ne, ez ê çawa bêjim ev berhem ne kurdî ye!

wîha dinêrim û dibêjim ew kurd e. Ez wilo li meselê dinêrim, tevî ku roja me ya îro ew mesele bêtir siyasî ye.

Ereb dibêjin xwediyê heft karan bê kar in. Taha jî hem şewekar e, hem helbestvan, hem rojnameger û pêşkêşvan e û hem jî romannivîs. Tu bêtir xwe li ku dibînî û ev rengîni û dewlemediyek e yan jî belavbûnek e?

Ez ne xwediyê heft karî me heyan. Rojnameger û nivîskar karek in, ez ne tembûrwan û ne jî hostayê mîkanîkê yê traktorê me. Henek li aliyekî, bi bawerîya min di demeke nêzik de, wê helbest bibin pêkenok. Jixwe di nav kurdan de her wilo ye. Dema helbestên gelek kesan, weke helbestvanên kurd ên tîne nasîn, dibînim kenê min bi wan tê û dilê min bi wan dişewite. Dixuyê ku ji betalî bûne helbestvan.

Bi bawerîya min berê me li romanê ye di sedsala bîst û yekê de. Helbest û metlok nema dikarin henekê xwe bi kul û derdê xelkê bikin. Li gorî min ew nema dikarin bibin bersiv ji bo van êşan.

Rewşa çand û wêjeya kurdî piştî destkeftiyên kurdan ên li Rojava û avakirina sazî û dezgehên kurdan çawa ye, çi guhertin çêbûne?

Li rojavayê Kurdistanê şoreşeke siyasî û heta radeyekê civakî pêk hatiye lê di aliyê wêjeyê û hunerê de hîn ew pêk nehatiye, wekî berê ye, wekî ku dibêjin heman tas û heman hemam e. Rast e, zimanê kurdî li Rojava tê bikaranîn û li dibistan û zanîngehan tê fêrkirin lê îdeolojiya siyasî tenê bi aliyekî rastiye dibîne û hîn parol û silogan û çepik ji wan re lazim in. Loma jî di van deh salan de tu nivîskar û helbestvan me nedîtîn. Tenê çend kesên ku xwe li ber tava heyvê li erdê dixin û gotinên qelew di bin navê helbestê de dibêjin hene. Mixabin ku niha tiştê serdest û berbiçav ew e ku van kesan didin pêş, ji bo çepik û lîlandinê tînin. Li gorî bawerîya min ez vê yekê zelal bêjim ku wêjeya xwe bispêre xwîna şehîd û qehremanan da ku bigihê astekê, ew ne wêjeyê ye lê ew tiştêkî pûç û pêkenok e. Ew mesele gelek dilê mirov diêşîne û bi rastî jî ew pirsgirêkeke biêş û jan e.

Beriya çend salan di hevpeyvîneke xwe de, te gotibû romana kurdî tune ye. Niha ew fikra te hatiye guhertin an jî bi giştî tu romana kurdî çawa dinirxîni?

Dîsa dibêjim romana kurdî tune ye lê çend romanên kurdî hene. Em dikarin bêjin helbesta kurdî heye, sitranên kurdî hene, siyasîmedarên kurd hene lê romana kurdî tune ye.

Niha hin nivîskar hene lê dem ji wan re divê da ku bikaribin nasnameyekê bidin vê beşê. Lê hinek kes hene ku dema kurd wan wekî romannivîs bibînin jixwe ew tofana kurdan e, ma ez ê çi bêjim! Di bawerîya min de niha dem hatiye ku em dest bi romana kurdî bikin.

Roman an jî nivîsa romanê girêdayî pêşketina civakê ye, yanî civakeke wekî civaka kurd ku hîn jiyaneke bindest û feodal dijî. Lewre jî bêtir helbest dikare cihê xwe di vê civakê de bibîne, lê roman rewşeke cuda jê re divê, rewşeke pêşketina civakî jê re lazim e.

Ji aliyekî din ve, di aliyê wêjeya kurdî de bi rastî kesên me yên affiner kêmin. Belkî hin kes hebin lê yên hatine naskirin ne bi wêjeya xwe lê bêtir bi rêya rêxistin û partiyên derketine holê. Rêxistinên siyasî wan ji xwe re bi kar tînin, ew jî rêxistinên ji xwe re bi kar tînin. Her yek ji wan karê xwe bi yê din dimeşîne. Her du alî jî ji ber nikarin xwe bigihînin civakê, hev du wekî pirekê bi kar tînin da ku xwe bigihînin civakê. Meseleya romanê

çandeke kûr jê re divê, divê em derewan li xwe nekin, em henekê xwe bi hev nekin. Gelo kê ji xwe baş li dîroka xwe vegeyirayê û tîrê şîrove kiriye? Heta em dikaribin xwe bispêrin wê û ji wê dîrokê hêz bigirin û romanê binivîsin.

Niha tiştên tê nivîsandin, bi piranî em teqlîda ereb, faris, tirk an jî Amerika Latîn dikin. Di demekê de van welatan bixwe jî teqlîda kesên din kir. Lewre jî em dibin kopyayek ji kopyaya kopyayan!

Her wiha bi rastî hinek roman hatin weşandin lê teqez ez nikarim bêjim ku ev romana kurdî ye. Lê mirov nikare ji bo van tiştên ku hatine nivîsandin bêje ku romana kurdî rengê xwe standiye û mirov dikare destnîşan bike ku ev romana kurdî ye. Ew şiklê romanê hîn tune ye. Lê ev tiştên ku em navê romanê lê dikin li gorî min em xwe jî dixapînin û xelkê jî pê dixapînin.

Ji bilî helbestên kurdî û erebî tu amadekariya romanekê jî dikî tu dikarî hinekî behsa wê projeya xwe bikî?

Ev çend sal in min romanek nivîsiye bi navê "Pêvedana Berfê" ev çend sal in hîn derneketiye ez difikirim ku niha dema wê ye.

Roman li ser Rojava û Sûriya salên 80'yî ye û guhertinên dîrok û mirovan piştî hatina tevgera azadiya Kurdistanê û guhertinên ku bi xwe re anîn. Hezîkirin, tirs, wêrekî, girî û ken hemû di vê romanê de hene. Ez li hêviyê me ku piştî çend mehan li Tûnisê bê weşandin.



Taha Xelîl kî ye?

Rojnameger û helbestvan Taha Xelîl di sala 1963'yan de li bajarê Qamişloyê hatiye dinyayê. Li zanîngeha Şamê beşa ziman û wêjeya erebî xwendiyê. Heta niha 5 pirtûkên wî yên helbestan hatine weşandin. Romanekê wî bi almanî hatiye weşandin. Her wiha ew şewekar e û bi tabloyên xwe tev li gelek pêşengehên li Qamişlo, Beyrût, Swîsre û Tûnisê bûye. Endamê Yekitiya Nivîskarên Swîsre û endamê rûmetê yê Nivîskarên Awusturyayê ye.



Samî Hêzil

Wergera wêjeyê ²

Li gor Roland Barthes wêje dibe du çiq. Li çiqekê helbest, berhemên pevbestî yên wek roman û çirok û drama hene ku nivîskarên wan der barê obje û fenomenên li cihanê tiştên sêwirandî an jî raçavkirî dinivîsin; û li çiqê din jî cureyêke taybet a nivîsê heye ku mijara wê obje û fenomenên derveyî nîne, lê berovajî vê, ew nivîsa der barê nivîsê bixwe de ye, an ku formulasyonên lînguîstîk ên ku ji hêla kesên din ve hatine saz kirin ji xwe re dike mijar, bi awayekî jî dibe şîrovekirina şîroveyekê.

Wergêr jî parçeyêke çîqa duyemîn e. Mijara wê nivîs bixwe ye. Di vir de xala girîng ew e ku tespîta Barthes cudatiya mijarê ya wan her du çiqên nivîsê nîşan dide, ne ku afirînerî û sêwiranê bike para cureyên wêjeyê û ji hêla din ve jî nivîsên der barê nivîsan

de, an ku meta-tekstan jî bike tiştên analîtîk. Di nivîsên ku dikevin koma duyem de jî afirînerî heye û ew tişt jî bo wergêrê jî derbasdar e.

O.F. Babler der barê wergêr de pênaseyêke balkêş dike û dibêje ku wergêr nivîskarekî taybet e di nav koma nivîskaran de ku karê wî/wê peydakirina peyvyan e li beramberî peyvên ku nivîskarekî din nivîsîne; formulêkirina fikran e ku nivîskarekî din beriya wî/wê formulê kirine; û pêşkêşkirina zanyariyan e ku yekî din beriya wî derpêş kirine. Gotinên Babler taybetiya nivîskariya wergêr, hêla wî/wê ya afirîner û barê ku pişt dike bi awayekî kurt û têgîner tîne ziman.

Gotineke klîşe heye di navbera wergêran de ku piranî ji bo nîşandana qîmeta karê wergêr tê bikaranîn:

“Çawa ku hebûna du destan têrê neke ku mirov bibe piyanîst, zanîna du zimanan jî têrê nake ku mirov bibe wergêr.”

Ev gotin hem pêwîstiyên ji bo pisporiya karê wergêrê û hem jî girîngiya pisporiya wergêr tîne hişê mirov. Perwerdeya wergera wêjeyê, hebûna tradîsyoneke wergêrê, pejirandina pîvan û helwestên hevpar ên der barê wergêrê de, nixandînen zanistî û akademîk der barê berhemên wergêrandî de û nixandîna kalîteya wergêran ji wan pêwîstiyên yên sereke ne.

Piştî wan gotinan em çend tiştan jî der barê wergera wêjeyê kurdî de bibêjin. Mirov bi hêsanî dikare bibêje ku wergêrên wêjeyî yên kurdî bi awayekî bi kalîte nayên nixandînin û rexnekirin. Rojava wergera kurdî divê ji nîqaşên têkildarî navê berhemên wergêrandî û

navê wergêran wêdetir be û ji populîzma zorpêdayî rizgar bibe. Mixabin helwesta xwîner, nivîskar û lêkolînerên kurd a li hember wergêrê bi têra xwe erênî nîne. Xwîner hîn jî li hember metnên wergêr wek biyaniyan disekinin; nivîskar jî wergêran disilikin; lêkolîner û zimanzan jî bi pîvanên teng nêzikî wergêrên wêjeyî dibin.


Piraniya nêrînen der barê wergêran de mixabin fikir û angaşên xav in û di hişê xudanên xwe de jî zêde nehatine nîqaş kirin. Gotina ‘wergera xirab zirarê dide zimên’ gelek tê bihîstin. Ew helwesta parastinê pîrî caran wek hesiyariyêke di radeya paranoyayê de xwe dide nîşan. Lewre divê bê zanîn ku nivîsîn—wergêrandin jî tê de—û axaftin zirarê nadin sistema zimên û eger em bi qewlê Sausurre bibêjin, di çarçoveya parole de ancax dikare ji nivîskar û axaftvan re navdariyêke xirab bîne. Her wiha wergera çirok an jî helbestekê ya nebaş eger zirarekê bide zimên jî, ew zirar jî ya çirok an helbestekê nebaş a ku bi kurdî nivîsandî zêdetir nabe. Jixwe di qada wêjeyê de jî hev cudakirina berhem/zimanê baş û nebaş çawa karekî hêsan nebe, bi heman awayî diyarkirina wergera edebî ya baş û nebaş jî ne hêsan e.

Angaşteke din jî ku pêr tê bihîstin wiha ye: “Tahma wergêrê jê tê.” Ew îfade her çiqas jî bo gelek berhemên tespîteke rast be jî, bi serê xwe nabe qusûreke wergêrê û wergêr. Ji ber ku mirov dikare bibêje, di gelek rewşan de eger tahma wergêrê ji wergereke neyê, hingê şikberiyên şikl û naverokê mezin dibin. An ku tahma wergêrê divê ji metna wergêrê bêtandin, lê bi qirarê xwêye, ne kêma ne jî zêde. Helbet ev mijar têkildarî tercîhê ye û her wisa

nîqaşeke teorîk e ku di dîroka wergêrê de pir tişt li ser hatine gotin. Algirên jêder-navend û armanc-navend jî bo helwesta xwe ya têkildarî wergêrê gelek fikir û têgehên girîng pêşkêş kirine. Ji wan wergera aşkere (overt) û sergirtî (covert) a House, biyanîkirin (foreignization) û kedîkirin (domestication) a Venuti, wergera belgeyî û wergera navgînî ya Nord tenê çend model in ku em dikarin navên wan binin.

Ji ber taybetiya wergera wêjeyê û rewşa wergera kurdî ku me li jor bi çend xalên sereke behs kir, wergêrên kurdî divê pir bi serîqevî tevbigerin. Wergêr divê tespîta bandora metnê ya li ser xwînerê ziman û çanda jêder li gor faktorên serdemî yên edebî bi awayekî berfireh bifikire û wergera xwe jî wisa biguncîne. Bi taybetî jî divê serê xwe bi têgeh û bêtîyên çandî, bi gotinên ku xweserê çanda berhemê ne ku hemtayan wan di çanda armanc de peyda nabin biêşîne. Peyv û gotinên aîdî çanda madî, edet, bawerî, çalakî, rê û rêbaz, hawirdor, iklim, folklor, taybetiyên lînguîstîk ên wek gotinên edetî, biwêj û hwd. tev li benda wergêr in. Lewre wergêr li gel du-zimaniyê divê di heman demê de kesekî du-çand be jî da ku xwe ji xeletiyên biparêze.

Wergêr bi xisara herî kêma ku li berhemê bixwe, bi dilsoziya pêwîst a ji nivîskar û berhemê re, bi parastina huner, şikl, naverok, şewaza estetîk a berhemê, bi temsîlkirina baştîrîn a zimanê xwe yê dayikê, bi baldariya der barê hêviyên de xwîner û fonksiyona wergêrê ya wêjeyî û bi sêwîrgirtina ji hemû çavkaniyên zimên ji bo afirandina berhemeke hevtayê berhema resen, dawîya dawî hewl dide ku teksteke têkûz biafirîne. Ew jî karekî qet ne hêsan e.



Wergêr çi ye?

Takî Çiftsûren

Piştî ku romana Sûc û Ceza ya Dostoyevskî hat wergêrandin, kovara Popkurdê meseleya wergera wergêrê/wergera ji zimanê duyem koland û ji wergêran pirsî. Tiştê min jê baş fêm kir ev e: Heta derfet hebin, berhemê divê ji zimanê esasî bîn wergêrandin.

Jixwe ji ber ku heta îro derfet tunebûne, ev berhemê piştî sed û pêncî salan ji zimanê duyem hatiye wergêrandin. Hewce nake mirov vê yekê bêje. Ya min jê fêm nekir jî ev e: Çawa wergereke ji zimanê duyem, esas ji tirkî ‘zirarê dide zimên’, ev ne zelal e.

Di nav van nîqaşan de ez li bersiva vê pirs geriyam: Gelo wî zilamî pirtûk çawa wergêrandiyê? Li gorî min bersivandina vê pirsê gelek zehmet e lê beriya nîqaşê bersivandina vê pirsê jî lazimtir e. Çimkî di derheqê wergera ku nîqaş li ser hatiye kirin de, ti tişt nehatiye gotin. Mirov bizanibe wergera Sûc û Ceza ya Dostoyevskî baş e yan xirab e, wê çaxê nîqaşê watedar bibin.

Tim Parksê ku li ser nixandîna wergêrê baş fikiriye, di hevpeyvînekê de wiha dibêje: “Ez dibêjim qey gere mirov pêşî vê pirsê bike: Em wergêrê dinirxînin an pirtûkê?”

Piştê jî wisa lê zêde dike, “Ger haya we ji metna esasî tune be, hûn di derheqê başî û xerabiya wergêrê de ti tiştî


nebêjin çêtir e.”

Li gorî wî gava haya me ji metna esasî tune be û em wisa dibêjin, em ji rastiya xwe û rastiya wergêrê dûr dikevin. Ji ber ku haya me ji metna esasî tune ye, dema em di derheqê wergêrê de tiştêk dibêjin, baş e yan xirab e, hinek ji ber xwe ve dibêjin. Çimkî metna ku em wergera wê bidin ber wê, ne li holê ye. Wek ku me di jiyana xwe de heta îro mişmiş nexwaribin û em rabin tama wan bidin ber tama mişmişên berê, ev nixandîn jî wisa li hewa dimîne. Nivîskarê amerîkî Edith Grossman jî wiha dibêje: “Dema em li gorî xwe wergêrê dinirxînin bi rastî em zimanê wergêrê dinirxînin.” Yanî tê vê wateyê: Ka em binêrin ev wergêrê me bi kurdî dizane yan na.

Di vê navberê de pirseke din jî tê bîra min: Gelo wergereke baş (tekûz) pêkan e?

Li gorî min ne pêkan e. Wergêr, herî zêde dikare bi wergera xwe nêzî metna esasî bibe lê nikare wê herî baş wergêrîne.

Niha di destê min de, du jê tirkî, yek jî kurdî, sê wergêrên Mirovên Reben a Dostoyevskî hene. Her sê jî ji hev cuda ne. Ji ber van her sê wergêran, ez dikarin bi dilekî rehet bêjin, metna esasî, ji van her sêyan jî cuda ye. Ger her sê ji hev cuda nebûna, yan dê wê çaxê di wergêrê de întihal çêbûya yan jî wergêr



dê motamot bûya.

Albert Camus dibêje: “... wergereke motamot tune ye.”

Ger wergereke motamot tune be, wergêr çi ye û çawa ye?

Nivîskarê tirk Ehmed Cemal, ji bo wergera metna edebî dibêje, “Pevbestina ku wergêrî di mêjiyê xwe de çêkiriye.”

Thomas Bernhard lê zêde dike û dibêje, “Pirtûk nayên wergêrandin, ji nû ve tîne nivîsandin.” Yanî, metna em jê re dibêjin wergêr, ne wergêr e, şîroveya wê ye. Rasterast dibêje, pirtûkên ji ber metnên min hatine wergêrandin, ne yên min in, yên wergêran e. Nivîskar û rexnegir

Edith Grossman di derheqê vê mijarê de wisa dibêje, “... wergêr jî dikarin metnên edebî, bi zimanekî din binivîsin.”

Ehmed Cemal dîsa di heman nivîsa xwe de dibêje, di her wergêrê de hêlên tekane hene. Wergêr piçekî metna esas e piçekî jî metneke nû.

Bi qasî ku min ji wergêr, wergêr û metna esasî fêm kiriye ev e: Wergêr tişteke xirab e lê ji ber ku ne pêkan e em bi hemû zimanan bikaribin pirtûkan bixwînin, wergêr, tişteke mecbûrî ye. Grossman dibêje, em bi saya wergêrê dikarin dinyayê binirxînin. Li gorî wê, nivîskarên cihanî, bi rêya wergêrê nêzî hev bûne.

Bi kurt û kurmancî ez dixwazim

bêjin, wergereke tekûz ne pêkan e. Tişteke din jî bala min kişand. Li ser wergera Sûc û Ceza ya Dostoyevskî (wergêr, Medenî Ogût, Nûbihar, 2020) gelek tişt hatin gotin lê di vê navberê de romaneke din a Dostoyevskî derket û kesî di derheqê wê de tişteke negot û nenivîsî. Romana Mirovên Reben (Avesta, 2020) a Dostoyevskî ku Hesênê Metê ji zimanê duyem wergêrandibû, bi çapa duyem derket. Lê “bertek”ên li dijî Sûc û Cezayê hatin nîşandin li hemberî Mirovên Reben nehatin nîşandan. Niha jî pirtûka wî ya Şevên Spî (wergêr, Firat Cewerî, ji weşanên Avesta, 2021) tê weşandin. Mirov meraq dike, çima gelo?

'Baweriya civakê bi hikûmetê nemaye'

Navenda Nûçeyan

Hikûmeta AKP-MHP'ê ji aliyekî ve bi êrîşan mafên mirovan tune dîke û ji aliyê din ve jî di bin navê reformê de plansaziye jî bo mafê mirovan amade dîke. Serokkomar Erdogan di 3'yê adarê de bi navê 'Plansaziya Çalakiyê ya Mafên Mirovan' navero-keke ku ji 11 xalan pêk tê, parve kir.

Têkildarî Plansaziya Çalakiyê ya Mafên Mirovan de serokê Baroya Amedê yê berê M. Emîn Aktar bi rojnameya me re axivî. Aktar diyar kir ku her çiqas hikûmet bi navê reformê qala plansaziya mafên mirovan bike jî baweriya civakê bi vê hikûmetê nemaye.

Ne xwezî pratîkî divê

Parêzer M. Emîn Aktar têkildarî Plansaziya Mafên Mirovan de ev tişt anî ziman: "Plansaziya ku ji aliyê serokkomar Erdogan ve hatî parvekirin bi rastî dema ku mirov li naveroka vê plansaziye mêze

dike tiştên ku der barê mafên mirovan de hatine rêzkirin tiştên esasî ne. Lê belê mirov dema madeyên dixwîne tê xuyakirin ku yekî tenê temeniyên xwe anîne ziman. Lê divê kesên rêvebir ne xweziyên xwe, waadên xwe yên ku her tim tînin ziman tînin meriyetê. Plansazî gav bi gav ger wek nexşeyêyekê jî bide ber xwe hewce ye gavên dê werin avêtin rêz bikin. Lê belê di vê plansaziye de ev yek tune ye û ne diyar e ku dê kengî van biryaran tînin meriyetê. Tenê dibêjin di demeke nêz de!"

Piştî guhertinên sala 2017'an

Aktar destnîşan kir ku li Tirkiyeyê piştî sala 2017'an dema ku di destûra bigehîn de pergala hat guhertin û hin guherîn ji bo serokkomariyê hat kirin êdî navê demokrasîyê bi awayekî temsîlî jî li Tirkiyeyê nemaye û wiha pê de çû: "Ji ber vê yekê ji 2017'an şûn de êdî li Tirkiyeyê ji aliyê qanûnî ve jî mirov nikarin qala demokrasîyê bike. Tê zanîn li

Serokê Baroya Amedê yê berê Mehmet Emîn Aktar têkildarî 'Plansaziya Çalakiyê ya Mafên Mirovan' a ku hikûmetê parve kiribû axivî. Aktar got ku baweriya civakê bi hikûmetê nemaye

welatên ku demokrasî lê heye, hêzango erkên dewletê yên wek qanûn, bi-rêvebirin û daraz hemû jî hevdu cuda ne. Yanî bi awayekî hem hevdu kontrol dikin hem jî di nav hevsgengiyekê de ne. Lê ev pergala li Tirkiyeyê piştî 2017'an ne hevdu kontrolkirin ne jî hevsgengiyek di navbera wan de maye. Ji ber vê yekê jî armanca wan a vê plansaziya ku bi navê mafên mirovan tê amadekirin ew e ku ji raya giştî bêtir dixwazin derdora navneteweyî bi vê plansaziye mijûl bike û bêjin ku vaye em reforman amade dikin."

'Bi hîn xalan guhertin pêk nayên'

M. Emîn Aktar di dawiya axaftina xwe de ragihand ku tu baweriya civakê bi vê hikûmetê nemaye û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Li Tirkiyeyê bi piranî



baweriya civakê ne bi gavên ku hikûmet biavêje ne jî bi gotinên hikûmetê nemaye. Ji bo vê yekê jî ji bilî reforman hewce ye pêşî hişmendî biguhere. Yanî

tenê bi hin madeyan mirov nikare qala guhertinan bike. Ger ev reform di rastiya xwe de bi pratîkî nekeve meriyetê dê tu wateya wan tune be."

Şengalî li ser pêyan e

Navenda Nûçeyan

Hikûmeta Iraqê tevî daxwazên gelê Şengalê jî li ser ferzkirinên PDK'ê û Tirkiyeyê hewl dide peyman Bexda-Hewlêrê ya di 9'ê Cotmeha 2020'an de hatibû îmzekirin, li dijî Rêveberiya Xweser pêk bîne. Li gorî agahiyan hêzên Iraqê ragihandine ku divê Hêzên Asayîşa Êzîdxanê ji navenda Şengalê derkevin. Tê zanîn ku zêdeyî 100 roj in gelê Êzîdî li dijî peymanê di nav çalakiyê de ne.

Di vê çarçoveyê de heta niha Rêveberiya Xweser gelek rêzehevdiştin bi rayedarên Iraqê, hêzên siyasî û Hikûmeta Federal a Kurdistanê re pêk anîne. Bi dehan meş û çalakî bi daxwaza betalkirina peymanê li dijî Şengalê li dar xistine. Daxwaza wan a sereke ew e ku di çarçoveya mafên destûrî yên Iraqê de xwedî rêveberî, hêzên parastina xweser bin û mafê wan ê perwerdeya bi zimanê dayîkê

hebe. Lê tevî van bertek û nerazîbûnên gelê Şengalê jî hikûmeta Iraqê bi daxwaza PDK'ê dixwaze peymanê têxe meriyetê.

Desteya Rêveber a Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê (MXDŞ) li ser zextên PDK'ê û hikûmeta navendî ya Iraqê ku hewl didin Hêzên Asayîşa Êzîdxanê ji navenda Şengalê derbixin, bi awayekî awarte li bin konê berxwedanê ya asayîşa Şengalê civiyan. MXDŞ, nûnerên PADÊ,TAJÊ û hemû sazî û dezgehên Şengalê tev li civînê bûn. Desteyê piştî civînê bi amadebûna gelê Şengalê encama civînê bi daxuyaniyekê aşkera kir. Daxuyani jî aliyê endamê MXDŞ'ê Hesen Hecî ve hat dayîn.

Hesen Hecî di axaftina xwe de diyar kir ku ji dema têkçûna DAIŞ'ê ya li Şengalê heta niha, komplot li pey hev li dijî gelê Şengalê tînin pêkanîn û wiha got: "Em dibêjin gelo çî ji gelê Şengalê dixwazin? Çawa gelê Şengalê vegeriya ser cih û



warê xwe, rewşa wan baş bû, dest bi jiyana xwe kirin, careke din komplot xistin dewrê."

Herî dawî gelê Şengalê tevî hemû astengiyên artêşa Iraqê jî bi hezaran welatiyên Şengalê li navenda bajêr kom bûn û dest bi meşê kirin. Di encama berxwedana gel û jinan de konvoya gel gihişt Şengalê. Bi hezaran kes bi hildana ala Asayîşa Êzîdxanê li navenda bajêr de meşiyen. Her wiha bi hezaran kes bi pêşengiya rûspî, bawermend, kesayet, siyasatmedar û rêveberên Şengalê jî meşiyen.

PE'yê xwest Tirkiye ji Sûriyeyê vekişe

Navenda Nûçeyan

Piştî civîna Neteweyên Yekbûyî (NY) ya têkildarî şerê li Sûriyeyê ku 10 sal in didome, Parlamentoya Ewropayê (PE) jî civînek li ser rewşa Sûriyeyê li dar xist.

Di civîna Parlamentoya Ewropayê de pêşnûmeyer der barê rewşa Sûriyeyê de hat amadekirin. Di pêşnûmeyer de li ser israra rejîma Beşar Esed a durrî rêyên çareseriyê hat rawestandî û hat xwestin ku bi serkêşiya Neteweyên Yekbûyî mekanîzmaya çavdêriya şer û pevçûnan were damezirandin.

Her wiha li ser mijara ambargo û sizayên li ser rejîma Sûriyeyê hat rawestî û bang hat kirin ku ew li dijî Rûsya û Îranê jî werin kirin.

Di pêşnûmeyer de li ser bînpêkirinên mafê mirovan jî hat rawestandin û hat gotin ku ne tenê rejîma Sûriyeyê lê Tirkiye, Îran û

Rûsya jî bînpêkirin dikin, her wiha bang li Tirkiyeyê hat kirin ku leşkerên xwe ji Sûriyeyê vekişîne.

Her wiha di rapora der barê Tirkiyeyê de hatiye gotin ku Tirkiye li Sûriye, Rojhilata Navîn û li Rojhilatê Deryaya Spî aştîyê dixwe nav talûkeyê.

Parlamentarên Ewropayê dan zanîn ku hê jî çeteyên DAIŞ'ê li herêmê çalak in û piştigiriya xwe ya ji bo koalîsyona navneteweyî dan xuyakirin. Her wiha bal kişandî ser rola girîng û çalaka Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) di şerê li dijî DAIŞ'ê de û wekî mutefikên xwe destnîşan kirin.

Ji aliyekî din ve di pêşnûmeyer de ji bo sûcên li dijî gelê Sûriyeyê hatine kirin cezakirin welatên Yekitiya Ewropayê hewl dan xwe zêdetir bikin. Her wiha hat gotin ku gelê Sûriyeyê ji sedî 90 di bin sînorê xizaniyê de dijîn û divê YE'yê alîkariya mirovî bixîne ji wan re.



Xweşkanî

Felemez Ulug

Li Şengalê kî çî dixwaze?

Di dema derbasbûyî de, serkêşên dewleta tirk îtiraf kirin ku ew zorê li hikûmeta Bexda û PDK'ê dikin ku şertên Peymana 9'ê Cotmehê ya di derheqê Şengalê de pêk bînin.

Di peymanê de tî gotin ku divê Asayîşa Êzîdxan çekên xwe deyne û dawî li xebatên xwe yên parastina gelê herêmê bîne. Her wiha li gorî peymanê divê sazîyên Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê jî xebatên xwe yên rêxistinîkirina gel bi dawî bike û divê sazîyên di bin rêveberiya meclîsê de ne, dewrî hikûmeta Bexdayê bînin kirin.

Bêguman ev zext û zordariya dewleta tirk, rasterast destwerdana li karê navxweyî yê Iraqê ye. Di qada navneteweyî de ev sûc e.

Dewleta tirk bi çeteyên bermahiye DAIŞ'ê re beşek ji axa Sûriyeyê dagir kir. Mirovan direvîne, fîdye dix-

waze, deverên dîrokî hildiwêşîne, xwezayê talan dîke û ev ne bes e li ser gel qetlîaman pêk tîne. Tevî ku ew hemû jî aliyê PDK'ê û hikûmeta Bexdayê ve tî zanîn jî ew ji hevkarîya xwe ya bi dewleta tirk paş ve gav navêjin.

Bi vê hevkarîyê re armanca dewleta tirk her çiqas dagirîkirina Şengalê be jî di bîngeha xwe de xeyalên sînorên Mîsakî Miliyê heye. Bêguman wek gava yekem ew dixwazin deverên stratejîk yên başûrê Kuridistanê dagir bikin û hebûna xwe ya li herêmê daîmî bikin.

Dewleta tirk ji bo bigihîje vê xeyala xwe argumanên mîna "PKK li Şengalê bi cih bûye" pir bi kar anî û tîne. Li ser vê îdiaya Tirkiyeyê, endamê Lijneya Asayîş û Parastinê ya Parlamentoya Iraqê Ebulxaliq Ezawî daxuyaniyek dabû û gotibû: "Li ber destê me belgeyek nîne ku hebûna PKK'ê li Şengalê

îspat bike."

Hêzên herêmî jî baş dizanin ku HPG li ser banga KCK'ê hêzên xwe yên leşkerî di nîsana 2018'an de bi awayekî fermî ji Şengalê kişandin. Lê gefên dewleta tirk ên li ser herêmê bi vê paşvekişînê jî bi dawî nebûn. Ji wê rojê haya roja me artêşa tirk li herêmê gelek êrîşên hawayî pêk anîn. Di van êrîşan de bi giranî kesên sivîl û şervanên YBS û YJS'ê bûn hedefa balafirên dewleta tirk.

Dewleta tirk li derveyî axa xwe sûcê mirovahiyê pêk dianî, lê kesî dengê xwe jê re nedikir. Bi taybetî PDK û hêzên iraqî jî bo ji nû ve li herêma Şengalê bibin serwer bi kêfxweşî ev êrîşên qirîkirinê dişopandin. Lê dema dîtî ku gelê Êzîdî tevî hemû êrîşan jî li ber xwe dide û bi gelê herêmê re tifaqa xwe xurt dîke, xwe bîrêxistin dîke, vê carê serî li lîstikên

qirêj dan.

Peymana 9'ê Cotmehê bi vî awayî hat rojevê. Li gorî peymanê PDK wê ji nû ve tîkeve Şengalê û mîna berê li herêmê serweriya xwe bidomîne. Ji bo ku dewleta tirk bigihîje xewn û xeyalên xwe yên sînorê Mîsakî Mîlî dagirîkirina Şengalê ji bo wê awantajek mezin e. Ji bo ev plan pêk were û di qada navneteweyî de li dijî bertek û nerazîbûnan neyê jî pêdivî bi hikûmeta Iraqê hat dîtî. Bêguman hikûmeta Bexdayê ya li ser dengên şikestî hatiye avakirin jî ji bo emrê xwe dirêj bike ji neçarî be jî tev li vê planê bûye.

Divê em vê dizanibin ku êdî gelê Şengalê bixwe dikare biryara xwe bide. Piştî êrîşên DAIŞ'ê yên di 3'yê tebaxa 2014'an de û şûn ve gelê Şengalê rêxistinîkirina xwe xurt kir. Ev civaka qedîm a bi dehan salan jî hemû pêdiviyên civakî bêpar hatiye hiştin, êdî bi

ked û îradeya xwe ve ji bo pêşerojek azad tîdikoşe. Êdî di wê zanebûn û girîngiya rêxistinbûna civakê de ye.

Ez bawer im ku berxwedana îroyîn ya gelê Şengalê endama Rêveberiya Weqfa Jinên Şengalê Feride Şengalî pênase kiriye. Şengalî dibêje: "Iraqê got, em ê we biparêzin, lê wan em bi komkujiyan re rû bi rû hiştin. PDK'ê got em ê we biparêzin, lê dema DAIŞ hat reviya û em bi hovîtiyê re rû bi rû hiştin. Lê PKK hat, em fêrî xweparastinê û xwerêxistinê kirin."

Tiştî ku dewletên metinger herî zêde jê ditirsîn jî ew e: Xweparastin û xwerêxistinîkirin. Têgeha bîngehîna êrîşên li ser Şengalê ev e. Li gorî hêzên metinger û hevkar mafê civaka Êzîdî nîne ku xwe birêxistin bike û biparêze. Tirsî wan ev e. Ji bo îradeya ku li ser vî esasî bi pêş dîkeve û mezin dibe tîk bibin dest dane hev.

Hîroşîmaya Rojhilata Navîn: Helebçe

■ Bêrivan Kayi

33 sal berê li ber çavên hemû cîhanê bi bombeyên kîmyewî li bajarê Helebçeyê komkujiyek bi destê Seddam Hiseyîn pêk hat. Komkujiya ku di 16'ê Adara 1988'an de pêk hat, ji her temenî 5 hezar kurd ji aliyê rejîma destbixwîn a Baasê ve hatin qetilkirin. Yê wek kujer li pêş xuya dikir Seddam Hiseyîn bû lê helbet Seddam jî piştî xwe dabû dewletên navneteweyî.

Em dikarin bêjin ku der barê komkujiya Helebçeyê de bi sedan berhem hatine nivîsîn û bi dehan belgefilm hatin çêkirin. Necmettîn Salaz jî yek ji wan kesen e ku têkildarî Komkujiya Helebçeyê pirtûka bi navê 'Hîroşîmaya Rojhilata Navîn' nivîsiye. Necmettîn Salaz dema ji girtgehê derdikeve û di nav wan bêderfetîyan de berê xwe dide bajarê Helebçeyê. Salaz ji aliyekî ve hem ji bo belgefilma Komkujiya He-

Nivîskarê pirtûka bi navê 'Hîroşîmaya Rojhilata Navîn' Necmettîn Salaz têkildarî Komkujiya Helebçeyê axivî. Salaz diyar kir ku ji bo pêşî li komkujiyan bê girtin, divê yekîti pêk were

lebçeyê dîmenan dikişîne hem jî bîra xwe bi gotinên kesên ku ji komkujiyê fi-litîne tije dike û tevan di pirtûka bi navê 'Hîroşîmaya Rojhilata Navîn' de kom dike.

Têkildarî Komkujiya Helebçeyê û bédengiya 33 salan a hêzên navneteweyî ya li hember komkujiyê de em bi nivîskarê 'Hîroşîmaya Rojhilata Navîn' Necmettîn Salaz re axivîn.

Hîroşîmaya Rojhilata Navîn


Salaz destpêkê qala pêvajoya nivîsandina pirtûka xwe kir û da zanîn ku hem dema nivîsandina pirtûkê hem jî dema belgefilma komkujiyê amade dike her carê jî ber giriyê di nîvî de dihêle û wiha got: "Ev xebateke kolektîf a ku min û hevalên xwe di navbera 40-45 rojan de hem materyalên pirtûkê

hem jî yên ji bo belgefilmên amade kiribû. Piştî ku ez ji Başûr vegeyriyam hatim, di nav 6-7 mehan de me ev xebata xwe hem wek pirtûkê hem jî belgefilma wê amade kir. Bi kedekê mezin û kolektîf arşîvek der barê Komkujiya Helebçe û Enfalê de me ji bo gelê xwe amade kir."

Firmayên DYA û Hollandayê

Salaz têkildarî bédengiya hêzên navneteweyî ya li hember Komkujiya Helebçeyê, diyar kir ku ev bédengiyek 'ji rêzê ye' û ev tişt anî ziman: "Danzandina Seddam û Eliyê Kîmyager bi awayekî lez û bez ji aliyê van dewletên navneteweyî ve hat kirin. Sedema vê leza wan em dizanin ku pêşî girtina li agahiyan bû. Lewre Seddam lawê wan dewletan bû û di şerê Îran-Iraqê de cî-

hana rojava yî hevaltîya Seddam dikirin. Di tunekirina Îranê de Seddam serbest bû û bêsînor bû. Heke di vî şerî de qels derkeve û di şerê li hember kurdan de didomand lawaz biketa jî destûra ku tedbîrên xwe bigirin, dabûn. Li ser vê yekê jî Seddam ev fersendên bêsînor bi kar dianîn û çekên kîmyewî yên ku ji aliyê dewletên navneteweyî ve jê re hatibûn dayîn, bi kar anîn. Me di belgefilma xwe de qala belgeyên gazên kîmyewî yên ku ji aliyê firmayên DYA û Hollandayê ve hatibûn dayîn jî kir. Piştî komkujiyê der barê van firmayan de tenê darazake çêker/ne ji dil dest pê kiribû lê ji bo ku têkiliya van dewletan di vê komkujiyê de hebû, nexwestin ev daraz zêde kûr bibin û vekirin û girtina vê darazê bûn yek. Yanî hêzên navneteweyî bi awayekî bédeng xwe ji vê bûyerê xelas kirin."



xistine çar parçe, çand û zimanê kurdan bi polîtîkayên tunekirinê re rû bi rû hiştine dê çawa qirkirinê li ser kurdan pêk tên wek 'Komkujiyê' pênase bikin? Mesele ev e."

Komkujiyên piştî Helebçeyê

Necmettîn Salaz di berdewama axaftina xwe de destnîşan kir ku di ser Komkujiya Helebçeyê re 33 sal derbas bûn lê kurd hê jî bi dehan caran rastî komkûjiyan hatin û wiha pê de çû: "Piştî Helebçeyê hê jî komkujiyên li ser kurdan didomin. Ji destê wan were heta ku kurdek jî bimîne dê wan tune bikin lê helbet ji destê wan nayê. Ji ber ku êdî gelê kurd gelekî birêxistinkirî ye. Kurd hêviya xwe ji dewletên navneteweyî qut kirine. Divê bendewariyên me ji hêzên ku bingeha dagirkeriyê li Kurdistanê amade dikin, tune be."

Ji bo pêşî li komkujiyan were girtin...

Nivîskar Salaz herî dawî bal kişand ser yekîtiya kurdan û wiha got: "Divê gelê kurd ji bo çareseriyê berê xwe bidin xwe û rêxistinbûneke cewherî ku pêşîya komkujiyan bigire. Astengiya herî mezin a li pêşîya yekîtiya neteweyî hin kes û derdorên kurd ên ku tenê xwe û berjewendiyên xwe difikirin. Êdî ev derdor li her çar parçeyên Kurdistanê tenê nasîn. Ez di wê baweriyê de me ku dê ciwanên kurd ji bo avakirina yekîtiya neteweyî li ber xwe bidin."



Pênaseya 'Komkujiyê'

Nivîskar Salaz di axaftina xwe de diyar kir ku li cîhanê jî gelek mînakên komkujiyan hene lê belê li Kurdistanê komkujiyê bi awayekî cuda diqewimin û wiha domand: "Li Bakur tenê di serdema komarê de zêdetirî bi dehan komkujiyê hatine kirin. Qirkirina Geliyê Zilanê, Tendûrek, Sason, Koçgiri, di dema Şêx Seîd de, di dema Seyîd Riza de li Dêrsimê ev tenê hin mînakên ku pêşî tîna bîra me. Li Başûr jî mînaka komkujiya herî xedar Komkujiya Helebçeyê ye. Li gorî qanûnên navneteweyî ger ku 3 kesên bi heman baweriyê ve bin û ji bo vê yekê werin qetilkirin ev yek wek 'Komkujiyê' tê pênasekirin û bi vê pênaseyê re hewce ye hêzên navneteweyî peywirên wek 'parastina wê civakê' bi cih binin. Ji bo vê yekê jî dema mijar dibe kurd ev peywir bi cih nayê. Ji ber ku van hêzên di dîrokê de welatê kurdan



Destar

Ehmed Pelda

Şerê hişê mirovan û yê çêkirî

Bifikire!

Ji nişka ve telefona te kilîf dibe û naxebite. Ne dikarî telefon bikî, ne dikarî înternetê bi kar bîni û ne jî dikarî agahiyên tê de kombûyî bi kar bîni. Her wiha înterneta malê jî qut dibe û telefon an jî kompûterên li malê yên din jî nikarî bi kar bîni. Destê te bi kîjan amûra elektronîkê dikeve, yan jî gava dengê te dibihê her tişt erka xwe betal dike.

Ji ber neçarî dixwazî biçî kar û tengasiyan li wir hel bikî. Lê bi awayekî elektronîk erebe venabe, bi kilîta destan vedikî, lê wê carê jî erebe bixwe naxebite. Zeman nemaye û dixwazî bi otobêsa navbajêrî bi rê bik-evî. Gava şênî lê siwar dibe her tişt asayî ye, lê dema tu hewl didî ku siwar bibî deriyê otobêsê ji xwe ber tê girtin. Yekî din tê ji wî re vedibe, careke din tu hewl didî dîsa asê dibe. Bi texsiyê diceribîni û gava tu nêz dibî, hemû derî ji xwe ber kilîf dibin û ajovan jî nikarin ji te re vekin.

Li ser vê neçarî dimîni, diqehirî û vedigerî malê. Mixabin wê carê jî deriyê apartmanê venabe ku biçî xaniyê xwe. Bangî mirovên malê dikî, yan jî li hin kesan re temî dikî ku şênîyên malê agahdar bikin û bîna ba te. Belê haya te jê çêbûye ku tiştên elektronîk bi destê te kar nakin. Lewma tu hemû şîfre û agahiyên xwe didî hevala xwe ku hesabên te yên elektronîkî veke û lêkolînan bike, yan jî hinekan, hin ciyan agahdar bike. Lê e-name naxebite, hesabên medyaya civakî yên wek Instagram, Twitter, Facebook û hwd asê bûne û venabin. Ji xwe browserên wek Chrome, Edge, Firefox... jî naxebitin. Dikevî şîkê berê xwe didî bankê. Li wir jî xuya dibe ku hesabê te betal bûye û nayê bikaranîn. Her wiha diçî marketê ku li wir jî kart naxebite û nikarî hesab bidî.

Tik û tenê yî. Hiş û mejî tevlihev bûye, derûnî xerab e û bêçare yî. Tenê bi mirovên der û dora xwe re dikarî, rû bi rû bibî û tîkîlî deynî. Li

ser vê yekê lava dikî ku li hin cihan bipirsîn, lêkolînan bikin ku ev bela û aşûte li ku, çawa û çima pêk hatiye?

Belê, piştî demekê ji te re tê gotin ku "sûcekî te heye û lewma, li gorî qanûnan hemû hesabên te hatine asêkirin û heyânî pirsgirêk çareser nebe, tîkîliyên te û yên navgînên elektronîk hatine qutkirin. Bi riya hişê çêkirî tu bi her awayî hatî dorbêçkirin. Bi riya kamerayan, sînyalên GPS, LTE, GSM, teknolojiya 5G û yên wek wê şopa tiliyan, pêlên deng, rengê rû û laşê te tê tespîtîkirin û tu bi ku de biçî yan jî dest biavêjî çî navgînê, ew bi xwe berê tîna asêkirin. Gava tu jê dûr bikevî jî bi asayî, wek her gavê dixebitin."

Li ser vê difikirî ku xetere çêbibin û ji xwe dipirsî; gelo min baca salane nedaye? Min kirêya xanî yan jî deynên cuda nedane? Dibe ku bi erebeyê sûcekî trafikê kiribe? An jî li malê der barê serwerên siyasî de gawên xwe kiribe û ev jî bi riya tele-

fon û navgînan hatibe bihîstin? Belkî jî beşdariya çalakiyêke civakî bûme ku ji hêla rayedaran ve nehatibe pejirandin, tiştêk qewimibe? Her çî dibe bila bibe lê kêmasiyek û sûcek heye!!

Belê ev senaryoyek e, lê bi vî awayî têra xwe senaryo, agahî hene. Jixwe tê zanîn ku bajarên bi riya hişê çêkirî/serwest (smartcity) li der û hundir her tiştî dikarin kontrol bikin, bibînin û destnîşan bikin. Bi vî awayî gelek nîqaş hene ku êdî divê qanûn, sîza, dadwerî li gorî wê bê sazîkirin. Ji xêncî hin îstîsnayan dibe ku pergala dadweriyê veguhere ser vî hîmî.


Kesekî ku li gorî pergale tevne-gere, divê ji mafê beşdariya aborî bê dîrxistin, tîkîliya danûstandinê di ser riya elektronîk re bîna asêkirin. Hemû hesab, qeyd û tîkîliyên wî ji bo demekê bîna betalkirin. Xwendekar be, mafê perwerdeyê bîna asêkirin û tîkîliya wî ya bi navgînên elektronîk û hişê çêkirî re bîna qutkirin. Tîkîliya kesian bi robotan, kompûteran,

TV'an, telefonan û hwd re bê bîrîn. Divê ji navgînên hatûçûnê, danûstandinê xizmetguzariyê, kargehên karû-xebatan jî bêpar bimînin.

Ev wê metirsiyê dide ku pergala agahdariyê û danûstandinê bi riya hişê çêkirî bîna kontrolîkirin û ev serdestiya şaristaniya mirovahiyê bike qurbanê maşîneyan. Her wiha tê gotin ku wê li dewsa dewletan kargehên monopol ên wek Google, Microsoft, Facebook... an go şirketên Silicon Valley serweriya xwe radigîhînin. Ev wek dîktatoriyeke nû tê bilêvkirin.

Gelo hîç hêvî nîn e?

Filozofê alman Richard D. Precht û gelekên wek wî xweşbînin. Ew dibêjin ku hişmendîya mirovahiyê ya kolektîf û pêwîstiya civakîbûnê her gav serweriyê dide destê mirovahiyê û maşîneyan jî dike berdest. Tengasiyên heyî ji ber teknolojiyê nîn in, ji ber kêmasiyên mirovan bixwe ne û ev tengasiyên şaristaniya me ne.



Ayhan Erkmen

"Newroza Siltanî
Toqmaqê xwe hilda hanî
Bihar û zivistan ji hev deranî"

Şaşayê Apê min wiha dest bi çîroka Newrozên Berê kir. Heya sala 1954'an di Bazarcixaxa Dîgorê de Newroz bi eşq û şên tê pîroz kirin. Çima heya sala 1954'an? Ez ê behsa wê bikim lê ji berî wê dixwazim behsa hin rêûresmên newrozên heya wê salê bikim.

Li gorî vegotina Şaşayê Apê min; êvara Newrozê li serxaniyan agir tîn vêxistin, dora êgir, serê şeniyên malê yek kevirên sêl (pehn) tîn danîn. Her kes kevirê xwe nas dike. Sibetirê li binê keviran mêze dikin, di binê kevirê kê de bihok (kêzik) hebin, qeder û qismet serê wan in.

Dîsa di serê daran de qutikên teneke dikutin, hundirên wan tijî xwe-liya sobê dikin, niftê hirdişnîn ser û êgir berdidin. Di destê her kesî de ji wan yek, du çira, di nav gund de dimeşin. Şaşa digot: "Di zarokatiya min de ji şevên gund ên herî xweş ew şevên Newrozên bûn. Ji aliyekî ve li ser xaniyan agir vêdiketin û ji alî din ve jî di destên me de çira, me stran digotin û em dimeşiyên."

Dayikên ku zarên wan di çaxê zewacê de ne, kilorên pir şor lêdixin. Keç û hort nivê kilorê dixwin û nivê din jî diavêjin ber kûçikan; kûçik bixwe û li kîjan alî mêzeke, qismetê wê keçikê an jî wî xortî, ji wê taxê an jî ji gundê wî alî ye.

Çîroka 'Newroza Me'

Lê wek gotina Şaşa, ev pîrozbahî heya sala 1954'an dikişîne. Di sala 1954'an de fermanarek tê tabûra Bazarcixê; ew mezinên gund dicivîne û dibêje "ev edetê kafiran e, çi karê we bi vî agirî, ve şevê û Newrozê re heye." Her çiqas yek, du rûspiyên Bazarcixê dibêjin "Na, ev ne edetê kafiran e, me ji kal û bavên xwe girtiye, Newroz, Newroza me ye" jî kêr nayê, fermanarek fermanê derdixe, dibêje "Qe-de-xe-ye". Ji

wê rojê şundatir li Bazarcixê Newroz êdî heya sala 1979'an nayê pîroz kirin.

Halbûkî agir tim li ba me pîroz bû. Dayikan agirên tendûran di kulfikên wan de bi rojan vedîştin, xwedî dikirin û bi wî tendûr ji cardin vedixistin. Agir vemirandin hela bi avê, gunehkî pir mezin bû. Dema av serdakirana û dengê çiziniyê pêketa, dilê mirovan di şûna êgir de dişewitî û fîza dikirin.

Erê di sala 1979'an de mamoste-

yekî ji Dêrsimî hate Bazarcixaxa me. Mamoste Maqal yekî cuda bû. Bixwe cizlavê pê dikir, meaşên xwe jî ji bo feqîr û fiqaran xerc dikir. Mamostê Fenê bû lê destê wî zîv û zêr bû, ji her tiştî fêman dikir. Nexweşiyên mirovan û heywanan, çekirina amûran... Dengê wî pir xweş bû û sazeke pir xweş jî lêdixist. Wî ji nû ve ruh da Newrozê; çîroka parîvekiribû efsûnî bû û ji tavilê ji hemû malan belav bûbû.

Di devê her kesî de ev çîrok hebû: "Dibêjin padişahêkî pir zalim hebûye, navê wî Dehaq bûye. Derdek dikeve govdê wî, di sermilên wî de birîn der-tên, di her birînekê de marek hebûye. Hekîm û loqman çareyê jê re nabînin. Çawa dibe hekimêkê tî û jê re dibêje "dermanê derdê te mêtîyê zaran e." Wê gavê kurd di bindestê wî de ne, Dehaqê zalim her roj serê du zarên kurdan lê dixê û mêtîyên wan dide ser birînen xwe. Demekê şûn de dilê celadan êdî vê yekê ranake, dewsa du zaran, zarekê dikujin, yekê berdidin, li şûna wî jî berxekê serjê dikin. Yên ber didin, dikişin çiyayan. Roja ku dor tê kurê Kawayê Hesinkar yê herî biçûk, Kawa tê xîretê kurê xwe nadê. Ji bo hevdişînê diçe ba Dehaq, lê dixê serê wî difirîne, êgir berî qesra wî dide, yên ku li çiyayan e, dema çavên wan bi êgir dikeve, ji çiyayan dadikevin deştê û hildiweşînin textê zordestiyê."

Li çar hêlên Bazarcixaxa me çiyane Çiyayê Porsix, Topa Şatiroxliyê, Topa Biçûk, Ziyareta Gulheyranê... Maqal tekerên kamyon û traktorên bi tevî xortan derdixistin ser wan çiyayan û şeva Newrozê di heman seatê de agir berdidanê. Li çar hêlên gund li ser çiyayan agir vêdiket. Gundiyên jî di nav gund de agir vedixistin. Wekî berê, keç û xortan çira hildigirtin, distran û dimeşiyên. Hê jî li Bazarcixaxa me, agirê Newrozê bi ruhê çîroka Maqal tê vexistinê.



Nexweşiya Alzheimerê

Fzt. Mustafa Onal

Alzheimer cureyeke xurifînê (demansê) ye. Demans, ji bo tevahiya nexweşî û pirsgirêkên jibîrkirinê navekî gelemperî ye. Em ê li vir li ser nexweşiya Alzheimerê rawestin. Ji ber ku pêwendiya Alzheimerê bi mejî re heye divê em hinekî qala mejî bikin.

Mejî di serî de bi kiloxê (hestiyê serî) tê parastin.

Mejî bi sereke ji 4 beşan (lob) pêk tê: Frontal, Pariyetal, Oksîpîtal, Temporal. Her beş, ji kar û tevgerên cuda berpirsiyar in.

Frontal: Navenda hişmendiyê ye. Ji karê wêkî plansazî, rêxistin, çareserîkirin, baldariyê berpirsiyar e. Demans, herî zêde bandorê li vê beşê dike.

Pariyetal: Ji bo têgihiştina hesta destdanê û yekkirina hestan ev beş girîng e. Pirsgirêkên di vê beşê de, di dest û çîpan de dibin sedemên tevîzîn, bêhestî û eşq.

Oksîpîtal: Beşa ji dîtîne berpirsiyar

ev beş e.

Temporal: Dengbîhîstin û bêhngirtin erkên vê beşê ne.

Mejîyê mirovên bitendurist xwedî pergaleke birêkûpêk e. Ji bo ku mejî karê xwe bike divê di navbera rehikan (rîşeyan) de danûstandineke domdar hebe. Lê carinan ji ber hinek sedeman ev danûstandin têk diçe û mejî nikare bi awayekî asayî karê xwe bike.

Ji pirsgirêkên di mejî de rû didin yek jê Alzheimer e. Proteînên bi navê beta amiloid li mejî berhev dibin û danûstandina di navbera rehikan de têk dibin. Ji ber vê şaneyên mejî hêdî hêdî dimirin û mejî biçûk dibe.

Nexweşiya Alzheimerê cara yekem ji aliyê bijîşk Alois Alzheimer hatiye pê-nase kirin. Bijîşk Alzheimer, di sala 1901'ê de li ser nexweşeke bi navê Auguste Deter (51 salî) lêkolînan dike. Tevgerên vê nexweşê ne asayî ne û tiştan zû ji bir dîke. Auguste Deter di sala 1906'an de dimire û bijîşk Alzheimer li ser mejiyê wê dest bi lêkolînan dike.

Alzheimer, encamên lêkolînan xwe di sala 1907'an de diweşîne. Ev agahî, zêde zêde bala cihanê dikişînin. Piştî van xebatên girîng Dr. Emil Kraepelin, ji ber pê-nasekirin û xebatên bijîşk Alzheimer, navê vê nexweşiyê Alzheimer datîne.


Alzheimer cureyeke xurifînê ye. Xurifîn an jî demans ji bo tevahiya pirs-girêkên jibîrkirinê tê bi kar anîn. Her demans, ne Alzheimer e. Alzheimer bi tenê ji van cureyan yek e. Mejîyê nexweşên Alzheimerî her diçe biçûk dibin.

Sedemê berbiçav mixabin ji bo Alzheimerê hîn nehatiye dîtin. Ji ber ku sedem nayê zanîn hewldanên ji bo başkirinê jî bi tenê ji bo jîholêkirina encamên nexweşiyê ne.

Sedemên diyar ên Alzheimerê tune ne. Lê ji hinek rewşên xeternak guman hene. Em dikarin van xetereyan wisa rêz bikin:

- Temenê dirêj
- Di malbatê de hebûna Alzheimerê (zîmkarî/genetîk)
- Nişankoma downê (Down Syndrome)
- Lêdanên li dijî serî
- Pirsgirêkên xewê
- Bêtevgerî/kêmtêvgerî
- Qelewiya zêde (Obezîte)
- Bikaranîna çixareyê
- Hipertansiyon
- Nexweşiya şeker
- Depresyon/tengijîn
- Zêdebûna kolesterolê (kolesterol, pirtikên rûnî ne û di xwîna jîndanaran de hene. Dema zêde bibin gelek nexweşî peda dibin.)

Nexweşiya Alzheimerê ji hinek qonaxan pêk tê. Bi gelemperî em dikarin



Alois Alzheimer

van qonaxan wekî qonaxa destpêkê, qonaxa navîn, qonaxa pêşketî bi nav bikin.

Qonaxa destpêkê, zêde ne giran e. Di vê qonaxê de nexweş dikarin bi tena serê xwe karên xwe bikin lê hêdî hêdî pirsgirêkên jibîrkirinê û plansaziyê dest pê dikin.

Qonaxa navîn, qonaxa herî dirêj e û bi salan didome. Di pêkanîna kar û tevgeran de pirsgirêk girantir dibin. Nişanên jibîrkirinê bêtir xuya dibin. Ji ber ku êdî nikarin bi hêsanî karên xwe bikin, tiştan bi bir bînin nexweş pir hêrs dibin.

Qonaxa pêşketî, qonaxa herî dawî û ya herî giran e. Di vê qonaxê de nexweş êdî ne serbixwe ne û pêdiviya wan bi alîkariyê heye. Nikarin bi hêsanî têkiliyê bi mirovên din re deynin.

Nişanên (Semptomên) Alzheimerê

- Jibîrkirin
- Têkçûna çalakî û tevgerên rojane
- Pirsgirêkên axaftinê, kirina peyvên çewt

Auguste Deter




- Pirsgirêkên derûnî, bîrayî, tevgerî
- Tevlihevkirina dem û cih
- Di nîrxandin û biryardayîne de astengî

Başkirin/terapî

Di destpêkê de me gotibû jî ber ku sedemên Alzheimerê ne diyar in, rêbazê berbiçav ji bo başbûnê jî mixabin tune ye. Bi rêbazên heyî armanc kêmkirina encamên nexweşiyê ne û bi vî awayî rawestandina an jî kêmkirina leza pêşveçûnê ye.

Bernameya başkirina Alzheimerê fireh e. Gelek pispor û rêbaz di vê bernameyê de cih digirin. Bijîşk, fizyoterapist, ergoterapist, derûnnas hinek endamên vê bernameyê ne.

Wekî her nexweşiyê, di Alzheimerê de jî, karê herî girîng para malbatê ye. Divê malbat pêwendiya xwe bi pisporan re qut neke. Ji ber ku nexweş tiştan zû ji bir dîkin û nikarin karên xwe bikin pir hêrs û hestiyar dibin. Divê malbat û pispor vê yekê ji bir nekin û bi gotinên xweş, bi rûken nêzî nexweşan bibin.



Alzheimer

Normal

Pîrozkerdişê zîwanêk ikrarê vînkardişî yo



Av. Cemile Turhalli

21ê Sibate Roja Zîwanê Dayîke ya Dinya ma pêniya xo da vera da. Na roje de semedê zîwanî herkes bî zîwanperest. Çiyêk ke semedê zîwan nêame vatene nêmend. Ame vatene ke, zîwan rihê ma yo, cûya ma yo, gonîya ma yo. No rista pîl kerd û vatîş ra vatîş vet merdim. Gonîya ma girîya, zerê ma qesya û helîya, nê qalan vera. Seba zîwan ma xo mirnenî, ma xo qehirnenî, ma zaf kewenî ver labelê ma no zîwan qet qalî nêkenî. Çiyêko balkêş esto ke merdim zaf çîyan biwazo/a labelê çiyek zî nêkero/a.

Merdîm heta enka pê pragmatîstîya xo heyatê xo dewam kerd. Çîna waşt kerd, çî nêwaşt ci ra fek vera da. Labelê merdimatiya ma û merdimatiya şaranê bînan nêmanena yewbînan. Şîma qet dî ke yew erêb, tirk, alman ya zî nijadêko bînan semedê zîwanî merdimanê xo pîroz kerd. Şîma qet dî semedê zîwanê dayîke panel ameyî dayene û bername ameyî viraştene? Na rewşe problemêk zaf pîl a û muhîm a. Eger zîwanêk bêro pîrozkerdiş, o wext zîwan tena semedê yew roje yo. Eger zîwanêk bêro pîrozkerdiş, yeno o mana ke peynîyê ma de mendo û coka ma zîwan pîroz kenî.

Ma çî wext zîwanê xo semedê rojek arde vîrê xo, ma o wext zîwanê xo vîrî kerd. Coka ganî ma pîrozkerdişê zîwanî ra fek vera bidî. Çîmkî pîrozkerdiş sembolê nostaljî yo. Ma hetê nostaljî de neheqî bi zîwanê xo kenî. Zîwanê ma çend hezaran serre ame qiseykerdiş, çend hezaran serre bermîyê ma, huya-yîşê ma, pêrodayîşê ma, heskerdişê ma û deyişê ma heta no se serre ganî

mendî. Ez bi fikre xemgîniye vana ke eger ma roja zîwanî pîroz bikerî, no pîrozkerdiş ikrar û vînkardişê zîwanî yo.

Helbet semedê şarêk, bindestî xeylê zehmet o. Bindestî hîşê merdiman keno vîni. Nêverdeno kulturê înan, baweriya înan aver şêro, nêverdeno wa xo bi xo şêrî. Nêverdeno ling bierzî, bivîno, bi çîmanê xo biewno, qal bikero, hes bikero û hetta bimiro. Çîmkî nê heminan gêno destê xo, keno milkê xo û xo bi înan pîl keno. Mezgê ma de çiyêk nêverdeno, mezgê ma gêno û dima ra mezgêk newe ma rê vera dano.

Ma zanenê ke şarê ma heta wextê cumhuriyêti zîwanê xo serbest qalî kerdene. Qalîkerdişê înan de problemêk çîni bî, labelê nuştîşan de estbî. Ma zanenê ke kirmanckî nuştîş çîni bî. Ma tarîxê xo dor verê dewletanê ke hukm ramnayî ra musayî. Ge-ge ma Rusan ra, ge-ge îranijan ra, ge-ge mîsyoneran ra û ge-ge zî arşîvanê Osmanîyan ra tarîxê xo bonder biyî.

No tarîx de nuştîşê Evliya Çelebî ra bigêrene heta arşîvê Safevî û nuştîşê Rusî Peter Ivanovich Lerch Peterî ra ma xo binêna nas kerd. Ma enka zanî zîwanê kurdî zaf dewlemend o, hewtan ra zêde zarawayê ci estî. Labelê zaf nêameyo nuştîş, coka ra hetê nuştîş de aver nêşîyo. Zarawayê kurmancî binêna xo ser mendo. Kurmancî medresan de bi perwerdayîşî aver şîyo. Labelê zakî/kirmanckî de tena Mevlut kewto bara ma. Zarawayê zakî na reye kewt binê bandorê kurmancî û erebî.

1923'î de, peynîya cumhuriyêti de zîwanê ma kurdî her ca de xedexe bî. Na reye, medrese zî destê ma de nêmendî. Qalîkerdişê zîwan her ca de xedexe bî. Baweriya ma, zîwanê ma, nameyê ma biyî dişmenê cumhuriyêti. Ma çend baweriyo xo, statuya xo, zîwanê xo waşt, tertelêyî kewtê para



ma. Nê tertelêyan de bi hezaran şarê ma ameyî kiştîş, bi hezaran surgun kerdî, bi hezaran zî pê qerarê Mehkemeyanê İstiklalî ameyî îdam kerdîş.

Mehkemeyanê İstiklalî de zîwanê Tirkî ameyî qiseykerdiş labelê nuştîşê înan bi tîpanê erebî bî. Bi zîwanê xo serê kurdan de hukm awan kerdî. Rojêk de derheqê Şex Saîd, Seyîd Riza, Elîşêr û xeylê şexsiyetanê bînan de qerar vetî û înan îdam kerdî.

Endamê na mehkeme semedê dewleta xo her çî girewtî çîmanê xo ver.

Rojêk dozgerê Mehkemeya İstiklalî ya Amedî derheqê xebatanê mahkema-yan ê serra 1960'î de îtirafêk kerd. Nameyê no dozgerî Ahmet Sureyya Orgeevren yo. No dozger îtirafanê xo de wina vano: "Rojêk yew ciwanêk ardî mehkema. No gede qet tirkî nêzanyêne. Hakim xo gore semedê sorgu ciwan girewt û dima ra hukmê îdamî da. Hukmê mehkema wina bî; 'Türkçe bilmeyen bir kimseden bu memlekette hayır gelmeyeceğinden idamına ...'

Şewa aye roje de no ciwan ame îdam kerdîş."

İtirafanê xo de dewom keno û vano; "Amed de Berê Koyî de otelêk bi nameyê Yalova estbî. Ez ewja de mendêne. Senî ke ez rakewta o ciwano ke tirkî nêzanyêne ame hewnê mi û qirika mi girewt mîyanê destanê xo û bi tirkî vat 'qey to ver da ke mi îdam bikerî?' û mi tehdît kerd. Heta serê sibayî çend reyan mi no hewnî dî. Ez biya sey delî..."

Ez serê sibayî şîya mehkeme û mi embazanê xo yê dozgeran rê vat 'Bîra-der eke ma ê ke tirkî nêzanê îdam bikerî o wext ganî ma pêroyê Amed û rojhelatî bidaliqnî. Ma ameyê tîya ke succaran ceza bikerî.' Mi înan rê qala hewnê xo kerd. Mazhar Mufit û dozgerê bîni vatî 'ti qarîş mebe, no gureyê ma yo.' Mi zî qala dozgerîya xo kerd û mabenê ma de munaqeşe vejîya. Ez û ê embazî bi şîfre ma rewşe Anqara rê resna. Hewtêk ra dima no telgraf mi rê ame:

"Birêz Ahmet Sureyya, Dozgerê Serreke yê Mehkemeya İstiklalî ya Amedî: Amacê ma oyo ke sereyê kurd û kurdîti heta peynî bipelçiqîyo. Embazanê xo yê dozgeran reyde pê bike. Lewnana çîmanê to ra." (Başvekil İsmet İnonu)

Dewletê zilmkarî, netewa xo pê zilm û zîwanê xo awan kerdî. Qet nêverdayî ke zîwanê bîni zî perverde bivîni û qalî bikerî. Zîmananê bînan qedexe kerdî û dima zî pê polîtîkaya asîmîlasyonî zerê xo de zîwan helnayî û vîni kerdî.

Tarîxê kurdan de serewedartişê kurdan heta cumhuriyêti zaf reyan lokal bî. Peyniya cumhuriyêti de serewedartişê înan bi hîşê netewî dewam kerd. Serewedartişê netewî hîşê kurdan hîra kerd. Çîmkî newe ra dest bi nuştîşê tarîxê xo û cûya xo kerdî. Eger nuştîşê ma destê ma de bibo, qedera ma zî destê ma de ya. Eger ma bi zîwanê xo binusnî û qalî bikerî o wext hewce nêkeno ma roja zîwanî pîroz bikerî. Zîwanê xo qal bikerêne, roja zîwan xo vîra bikerene!..

Qirkerdişê Gazî 26 serrî yê xo de paweyê edaletî yo

Merkezê Xeberan

Taxa Gazî ya Stenbîlî de ke tede kurdê elewîyî ciwînenê 12ê adara 1995'î de tay kasanê nenasan pê çekan hêrişê qewexaneyanê Ontaş, Yavuz, Dostlar û pastaxaneyê Sarioğlu kerdî. Hêriş de Halîl Kaya (76) ame qetilkerdene û 25 kesî birîndar biyî. Hêrişî ra dima şar ver bi qereqolî rayîrî ra şî. Polîsan şarî ser o guleyî raşnayî û Mehmet Gunduz qetîl kerd, xeylêk kesî zî birîndar kerdî.

13ê adare de 15 hezar kesî seba protesto ameyî taxe û mabênê polîsan û şarî de pêkewtişî qewimîyayî. 14ê adare de taxe de qedexeyê tebervejîyayîşî ame îlankerdene la hêrsê şarî dewam kerd. Leşkerî sewqê taxe biyî. Anqara de protestoyê Gazî de 36 kesî birîndar biyî. Hetê bîni ra taxa Gazî de komîteyêke ronîyaye û çar çiyî waştî; wa qedexeyê tebervejîyayîşî betal bo, destbendkerdeyî vera bidîyê, polîs û leşkerî wa anêgêre taxe, cenazayî bidîyê. Waştîşî ameyî redkerdene û hema roje 15 kesî merdî.

1ê Gulane de Umranîye de protesto-yan de polîsan 5 kesî qetîl kerdî û bi nê hawayî hûmara merdeyan biye 22 û yê birîndaran zî biye 150. Bi hezaran kesî zî ameyî destbendkerdene.

Nê destbendkerdeyan ra yew zî Hasan Ocak bi. Roja destbendkerdişî ra 55 rojan ra dima 55ê gulana 1995'î de daristan de cenazaya Ocakî dîyaye ke tira

îşkence amebi kerdene û goristanê bêkasan de ameyî definkerdene. Polîsan verê muracatanê keyeyî de qet qebul nêkerd ke înan Ocak destbend kerd. Keye temmuzê de muracatê Mehkemeya Heqanê Merdiman a Ewropa (MHME) kerd. MHME seba ke heqê cuye binpay kerdî cezaya tazmînatî daye dewleta tirkê.

Eşkera bi ke serebutan de 7 kesî pê guleyanê polîsan kiştîyayî. Dewaya vera 20 polîsan 8 serran dewam kerd. Têna nînan ra 2 polîsan Adem Albayrak û Mehmet Gundoganî cezaya zîndanî girewte, 18 polîsê bîni vera dîyayî. La bira ceza newe ra ameyî betalkerdene. Keyeyan dewa ra xo apey ante û muracatê MHME kerd. MHME reyna cezaya tazmînatî daye Tirkîya.



Prosesê muhakemekerdişî de qet yew selahîyetdarê dewlete sey mesuldar nêameyî mojnayene. Serekwezîra ê çaxî Tansu Çiller, Mudiroyê Pêroyî yê Asayîşî Mehmet Agar, Waliyê Stenbolî Hayrî Kozakçıoğlu herinda ke hesab bidê wayîrê hêrişan vejîyayî.

Rojanê verênan ê serebutî de rayumûmîye PKK kerd hedef la Serekê Dayîreyê İstîxbaratî Hanefî Avcıyî na îdîa red kerde û da zanayene ke beşanê îlegalan ê dewlete no qirkerdiş kerd. Avûkatanê dewa seba ke qisey bikero vengê Avcıyî da ke bêro mehkeme.

Merasîmê yadkerdişî yê serrgêra 20. de avûkatanê dewa ra Remzî Kazmazî wina vat: "Çira Hanefî Avcî qisey nêkeno? Wijdanê ci çin o? Eke o qisey bikero qetî na dewa newe ra do bêra akerdene."



Mektebê Çewlîgî mezbut nêameyî viraştene?

Çewlîg herêma tewr rîskîn ê erdlerzî de ca gêno. Fayê Vakur û Rohelatî Çewlîg de resenê pê. Çewlîg de timî erdlerzê nizmî û 30 serran de yew zî 6.0î ra gird erdlerzî qewimîyenê. Tewr peynî serra 2003'î de erdlerzêk nan de îqazan kenî û dîyar kenê ke beno ke 7.0î ra hîna gird erdlerzêk biqewimîyo. Badê erdlerzê 2003'î mektebê herêma ameyî pîtkerdene, la na rewşe nişan dana ke awaniyî çiqas xirab ameyî viraştene. Der-

heqê babete de Şubeyê Çewlîgî ê Eğıtîm Senî eşkerayîyêka nuşteki da û va: "Ma vatêne qey dewlet û rayaumumî enkazan ra ders girewtî. Ma rê ame vatene ke awaniyê ke xira biyî ê kehen î. La ma vînenê ke wina niya. Çîmkî Çewlîg de mektebî yenî pîtkerdîş. Awaniyê mektebê ke erdlerzê 2003'î de xisar dîyî estî. Nê awaniyî nika yenê pîtkerdîş. Nê mekteban de performansê erdlerzî ame kerdene? Ma paweyê cewabê persanê xo yî." ÇEWLİG

Hetîketiya melayê gund

Demên borî mirovên gundan her şev li malekê komê hev dibûn, di wan şevên dirêj de demên xwe bi hev re dibihorandin, yê di nav wande her kî ji wan zêde meselok, çîrok, çîrçîrok, serpehatî an jî gotinên pêkenok bizaniya, ew kes bi qedir û qîmet bû, hertim cihê wê/wî li serê jorê bû. Mixabin hinek meselok kurteçîrokên wan jî bê sînor û bê pîvan bûn, di eslê xwe de, di her meselok û kurteçîrokên wan de jî dersek hebû. Ev kurteçîrok jî vê yekê dide berçav ku kiryarên baş an jî nebaş her çendê di ser de bihore jî nayên ji bîr kirin.

Rojekê melayekî li pêşiya cemaetê game digire, nimêj dike, gava ku xwe qusê erdê dike diçe secdê, zor pê dikeve bayek ji ber diçe. Mela gelek ber xwe dikeve, ji şerman diçe rûyê wî dikeve binê erdê. Piştî ku cemaet belev dibe, bi lez û bez diçe mala xwe ji wî gundî bar dike, diçe gundekî dût. Sal û zeman di ser de derbas dibe. Pir bêriya gundê xwe dike, rojekê xwe bi xwe dibêje: Ez ê biçime gundê xwe, gelek sal di ser de derabas bûn, niha wan tira min ji bîr kiriye.

Radibe tevdira xwe dike berê xwe dide rê bi ber gundê xwe ve diçe, gava digihîje nêzî gund rastî şivanekî tê, piştî silav û kêfxweşî didin hev mela dibêje:

-Tu çend salî yî?

Şivan dibêje: Welle ez salên xwe nizanim lê diya min dibêje ew sala ku melayê gundê me di mizgeftê de tir kirye, tu wê salê hatîyî dinê. Mela piştî stûyê xwe dixwirîne û cardin paşve vedigere.

Yasemîn Elbak



Tiştanok (mamik)



1-Mamê mino mamani
Çar bira ne, çar diyar in, yek germ, yek hênîk, yek şilî û yek jî sar.
De bêjin ew çî ye?

2-Tiştêk min heye
Çar çeq in çeqîn dîkin
Du belbelîn dîkin
Heştê balatirê

3-Tiştêk min heye
Çar kaniyên bireka
Av jê anîn zîreka

Çavkanî: Mamikên Botanê

Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî

Bersivên me ev in:

1- Demsal 2- Dewar, hesp 3- Guhanên gêlekê

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Bi hêvî me ku bi dilê we bin. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkên da ku em wan jî biweşînin.

Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin. De werin em dest pê bikin û pîrsa xwe ya her tim bipirsin.

→ Gelo kî dikare sê caran li pey hev bêje:

Şeş şeyê mala şeyê hene
Çi şer ji şerê segên Şeyê xweştir nîne


→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
Şînê bi şehê şîn, şeş caran porê xwe şeh kir

→ Heke ew jî nebû dê ji sedî sed ev çêbibe:
Şêr şaş dibin ser şewqa şevqê

Çavkanî: Zûgotinok
Berhevkar: Mihemedê Kurdo



XAÇEPIRS



JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Ziman 3. Pêxemberek
5. Asteng 6. Hal, şêwe, şikil
7. Qul 9. Ava ku pêşî lê tê girtin
12. Heywaneke avî ku goştê wan tê xwarin 14. Baş, qenc
15. Bajarekî rojhilatê Kurdistanê 17. Fêkiyê havînê
18. Bersiva neyênî 22. Xwediyê malê, mazûvan

JI JOR BER BI JÊR

1. Rengêk 2. Rih
3. Cejin
4. Vexwarina sereke
5. Fêkiyê ku hem ter û hem hişk tê xwarin
7. Ne tamam, kêr
8. Ne xerîb, xizim
10. Bi zimanê zarokan xwarin
11. Meha destpêka biharê
13. Bawerî
14. Çemêkî navdar ê Kurdistanê ku di strana "Xalo" de navê wî derbas dibe
16. Bajarekî rojhilatê Kurdistanê
19. Ji nişka ve
20. Saet, dem
21. Rojê hefteyê
23. Cînavka şanîdanê ya ji bo kesê nêzîk

Bersiva hefteya borî



Ziyareta Girkuvî û Çarşema Serê Zîpa

■ Qedri Esen – Felat Niştiman

Weke gelek navçe û bajarên bakurê Kurdistanê, li navçeya Farqînê ya Amedê jî gelek ziyaretgeh hene. Lê balkêş e, têkildarî dîroka van ziyaretgehên agahiyên pir zelal tune ne. Yê hene jî çavkaniya wan bi xweşîkî nayê zanîn. Di piraniya lêkolînan de ku li ser wan hatine kirin jî kesên ziyaret bi wan hatine binavkirin, weke weli/şêx hatine danasîn û gelê herêmê di rojên diyarkirî de diçin ser van ziyaretan.

Yek ji van ziyaretan jî ziyareta Girkuvî ye. Ziyaret li gundê Dêrika Miqûrê (yek ji gundên herêma Şewlê Miqûrê ye ku li bakur-rojavayê navenda Farqînê ye), li ser girekî bilind ê bi dar û ber e. Weliyê li vê ziyaretê veşartî jî kesê bi navê Şêx Mihemed e. Li gorî lêkolînan zanistî ku têkildarî ziyaretê hatine kirin; Şêx Mihemed kesekî ji sewalan hezkirî bûye. Tê gotin ku li ser girê niha ziyaret lê ye, sewalên kovî xwedî kirine û bi wan re mijûl bûye. Ji ber vê jî li şûna navê wî navê Girkuvî li ziyaretê hatiye kirin. Li ser ziyareta Girkuvî ne tenê mezelê Şêx Mihemed heye, gelek mezelên din jî

hene. Kesên ji gundên derdorê hatibûn ser ziyaretê diyar kirin ku ji berê ve û niha jî, ji ber ev der ji bo gel cihekî pîroz e, hin kes beriya bimirin wesiyet dikin ku li vê ziyaretê bîn veşartin.

Mirov xwe dikewînin

Her çarşem gundiyan gundên derdora ziyaretê diçin serdana ziyaretê û mirazê xwe ji ziyaretê dikin. Lê Çarşema Serê Zîpa û 2 çarşemên (piştî du çarşemên ewil, çarşemek navber dikevê) piştî wê ji Farqîn, Pasûr, Hezo, Sason, Amedê û gelek cihên din bi hezaran kes tînan serdana ziyaretê. Kesên tînan ziyaretê ji bo bayê laşê wan derkeve, li ber agirê dadidin xwe bi kevirên bi agir sorkirî dikewînin.

Destpêkê agir dadan

Bi munasebeta Çarşema Serê Zîpa me jî di nav hefteyê de roja çarşemê ji Amedê berê xwe da Farqînê û di saetên serê sibehê de çûn ser ziyareta Girkuvî. Li ziyaretê me tiştên balkêş dîtî û dixwazin ji we re qala vê bikin. Serdana ziyareta Girkuvî serê sibê dest pê dîke û heta reşika mexrebê didome. Bi taybetî kal, pîr û kesên navsere yê nexweşiyên wan ên romatîzma û hestî hene tînan ser vê ziyaretê. Lê me dît ku gelek malbat bi zar û zêçên xwe ve hatibûn vê derê. Kesên ji bo nexweşiyên xwe tînan li aliyê hatina ser ziyaretê êdî bûye wek çandê geşt û guzarîyê jî. Ji ber vê jî li ziyaretê dema Çarşema Serê Zîpa çarşeyeke biçûk tînan û gelek tişt tînan firotin

Ji ber ku ziyaret li ser girekî bilind e, piraniya ziyaretvanan bi wesayîtan hatibûn. Lê gundiyan jî gundên derdora ziyaretê yênan ku bi ker û hespên xwe jî hatibûn hebûn. Kesên tînan ziyaretê heta firavîna xwe li ziyaretê nexwin naçin. Ji ber vê kesên ku hatibûn ziyaretê destpêkê ji bo xwarinê agir dadan. Li ser vî agirî hem xwarina xwe çêkirin hem jî kevirên ku pê sor kirin xwe kewandin.

Ji kevirên kewandinê hewş çêkirine

Kevirên ku xwe pê kewandin ji derveyî ziyaretê anîn û piştî ku xwe pê kewandin birin danînan dora gora Şêx Mihemed. Ji ber vê li dora gora Şêx Mihemed hewşekeke biçûk a ji van ke-



Ziyareta Girkuvî ya li navçeya Farqînê ye û navê xwe ji gir û sewalên kovî digire ku ji aliyê Şêx Mihemed ve li ser gir hatine xwedîkirin. Her sal bi hezaran kes berê xwe didin ser ziyaretê

virên kewandinê hatiye çêkirin. Kesên hatin ser gorê 7 caran li dora gorê geryan û mirazê xwe ji Şêx Mihemed kirin. Ji bo ku daxwazên wan bînan qebûlkirin, benikan bi dara ser gorê ve girêdan. Lê balkêş bû ku hin kesan li şûna benikan berdevkên (maske) xwe yênan parastina ji vîrûsa koronayê jî bi darê ve girêdan.

Balkêş bû hin kesên ku bi girêdana benik û berdevkan a bi darê ve û kewandina bi keviran qanih nedibûn, keska li ser kêlika gora Şêx Mihemed bi ser û laşê xwe didan û bi vê rêbazê daxwaza başbûna xwe jê dikirin. Lê ev dibû sedema nîqaşê di nav ziyaretvanan de. Kesên ku serî li vî rebazê nedidan, kesên wiha dikirin û ji usûlê derketinê sûcdar dikirin.

Kewandina pezkoviyan

Ji bilî van çavdêriyan xwe, em bi çend kesên hatibûn serdana ziyaretê re li ser armanca hatina wan û çîroka

ziyaretê axivîn. Me ji Yusûf Ziya Orakçi ku ji gundê Xweşika yê herêma Badika hatibû serdana ziyarete, çîroka Girkuvî pirsî. Orakçi destnîşan kir ku dîroka ziyaretê baş nizane û têkildarî efsaneya ziyaretê agahiyê balkêş bi me re parve kir. Orakçi got, bi qasî ku wî ji mezinên xwe bihîstiye; hin mirovan li ser gir dîtine ku pezkoviyan agir dadaye û xwe bi kevirên li ser agir sor kirine kewandine. Ji vî rojê ve mirov tînan ser ziyaretê û mîna pezkoviyan agir dadidin û ji bo bayê di laşê wan de derkeve bi kevirên sor dikin xwe dikewînin.

Ji bo mirazên xwe duayan dikin

Jina navsere Xezal Baxçî jî der barê ziyareta Girkuvî de diyar kir ku Şêx Mihemed di dema eshabiyên de şehîd bûye û misilman ji wê çaxê ve ye tînan ser vê ziyaretê. Baxçî destnîşan kir ku her çarşem mirov tînan ser ziyaretê lê çarşemên sibat û adarê bixêrtin û

wiha got: “Dema tu werî xwe bavêjî vî mekanî, çî meqsada te hebe xwedê tîne cih û ji nexweşiyên baş dibî. Yênan yasinê dizanibin yasinê dixwînin, yênan dereka wan biêşe xwe bi kevirên sor dikewînin. Kevirê sor ji bo bayê pir baş e.” Her wiha jina bi navê Emîne Ezer jî got ku ew ji bo laşê xwe bikewîne hatiye ser ziyaretê da ku bayê laşê wê derkeve.

Li ser ziyaretê tenê agir nedihat dadan û rûresmên olî nedihat kirin. Helbet li cem van kêf û şahî jî hebû. Kesên ku bi hespan hatibûn ser ziyaretê hespên xwe li hemberî hev bezandin û bi wan şanidaniyek bi ços pêşkêş kirin. Her wiha kesek jî bayê eşqê hatê û bi sewteke xweş kilama dengbejiyê ya “Helîmcanê” got.

Serdana gel a ser ziyareta Girkuvî bi armanca pêkananîna rûresmên olî dest pê kiribe jî dikare bê gotin ku bi demê re bûye cihekî ji hiş û bîra civakê.

'Zîp im zîpedar im'

Gelê kurd gelek girîngiyê dide demê û li gorî şert û mercên demsalan dem senifandiyê. Li gorî vî sefandinê; dawîya meha sibatê û hefteya destpêkê ya meha adarê weke Zîp bi nav kirine. Di vî demê de weke nîşaneyê biharê hewa germ dibe û xweza zindî dibe. Li ser vî gelek gotinên pêşiyên hene. Yek ji van gotinan wiha ye: “Zîp im zîpedar im, eger bibarim xweş bihar im, eger nebarim sermardar im”. Çarşema dawîna meha sibatê weke Çarşema Serê Zîpa hatiye binavkirin. Di vî çarşemê de kurd ji bo nexweşî û bayê di canê wan û sewalên de derkevin, porên xwe û piçên sewalên xwe diqûşin û bi bayê re ber didin.

Tuna Altinel

Hakkari'de Bir Mevsim... Ev navê filmeke li ser serpêhatiya rewşên bîrekî tirk e ku xizmeta xwe ya leşkeriyê di salên 1960'î de li Colemêrgê kiriye. Bingeha ev filma li ser bîranînan Ferit Edgu ne ku nivîskarekî tirk e. Di wan salan de li şûna xizmeta leşkeriyê ya klasîk, hîndekariya di dibistanên seretayî yênan herêmên “paşvema” yênan Tirkîyê de gengaz bû. Edguyê ku ji vî derfetê sûd werdigire, li gundekî Colemêrgê dixebite. Ev bi rewşên zivistanê yênan gelekî dijwar re rû bi rû dimîne. Ji destpêka vî filmê heta dawiyê, mamosteyê me hewl dide rewşa xwendekarên xwe bi pêş bixe. Ev li ser wateya peyva “paşvema” qet fi-kiriye? Ez nizanim.

... Dema ku di salên 70'î de ez zarok bûm, min gelek caran digot min dixwest ez Colemêrgê bibînim. Çima? Ez nizanim. Dibe ku di çavên zarokê de ku li Stenbolê dijîya, Colemêrgê durtirîn bajarê Tirkîyeyê bû. Di pola me de nexşeyê Tirkîyeyê hebû ku bi qasî min dirêj bû. Anku dûrahî

Hakkari'de Bir Mevsim*

di navbera Stenbol û Colemêrgê de bi qasî bejna min bû. Gelekî dîr! Di wê demê de min nezani ku dûrahiya di navbera van her du bajarên de ne tenê ya erdnîgarî ye. Wê demê min nedizani ku li Tirkîyeyê kesên ku bi tirkî naaxivin jî hene.

... Di destpêka salên 80'î de pêvekeke rojên yekşemê ya rojnameya Milliyetê hebû. Zeynep Oralê tî de nivîsên li ser çandê dinivîsandin. Hin ji wan nivîsan li ser çêkirina “Hakkari'de Bir Mevsim” bûn. Nivîskar li ser dijwariyan ku ekîba filmê pê re rû bi rû bûbûn, dinivîsandin. Di nav van dijwariyan de hin, bo nimûne rewşên zivistanê, ji bo min xwezayî bûn. Yekî ji wan ez gelekî heyirandim. Di navbera ekîba filmê û niştêcihên gundê de ku lê film dihat amadekirin, pirsgrêkên ji hev fêmkirinê hebûn. Gundiyan bi tirkî nedizani! Li Tirkîyeyê kesên ku bi tirkî

nedixivin jî hebûn. Ev waneya min a yekemîn a kurdî bû.

... Piştî gelek salan ez çûm wan herêmên dîr. Cara yekem, ez hefteyekê li Amedê mam. Ev di sala 2013'an de ji bo beşdariya civîneke matematîkê bû. Her cara ku ez diçim bajarekî nenas, heya ji destê min tî ez li derdorê digirim. Li Amedê di 'Pêvajoya Aştiyê' de, ev gelekî xweş û hêsan bû. Ji bo hemû niştêcihan ku rastî min hatin, ji zarokan heta pîran, ev diyar bû ku ez ne ji Amedê bûm. Gelek caran, ji bo xwestina tiştêkî yan jî tenê ji bo axivîna zarokan gazî min dikir: “Turîst! Hello!” Di rewşên wisa de, heke ez li bajarekî Tirkîyeyê bim, ez ji refleksê dibêjim “tu dikarî bi tirkî biaxivî.” Ewil, hindik mabû min ev bigota, lê ji nişkê ve ez lal bûm. Zimanê vî bajarî ne tirkî bû.

... Di tebaxa 2016'an de, ez çûm Nisê-

bînê. Pêvajoya Aştiyê bi qasî Colemêrga ji Stenbolê dîr, ew qasî jî me dîr mabû. Dema ez li kolanên nezîkî dêra Mor Yakûb dimeşiyam, jinek ji mala xwe derket. Piştî ku wê ez dîtîm, wê dest bi axivîna kir û taxên nêzik ên ku di şerên hendekan de hatibûn hilweşandin, nîşanî min dan. Hêsiyê jî çavên wê dihatin û wê axaftina xwe domand. Min nedikarî tenê peyveke wê jî fêm bikim. Min dikarî hestên wê texmîn bikim lê di navbera me de tu axivîna çênebû.

... Di 2017'an de, ez cara yekemîn li Colemêrgê bûm. Çil sal ji xewnên min ên zaroktiyê derbas bûbûn. Du xortan ku bi lez fêm kiribû ku ez ne ji wê derê me, dest bi axivîna bi min re kir: “Turîst, hello.” Vê carê ez tecrûbedar bûm û bersiva min bû: “Merhaba.” Ez ji ekîba Hakkari'de Bir Mevsim bi şanstir

bûm. Wan ciwanan tirkî baş dizanî. Em li ser gelek tiştan axivîn; xewnên wan ên pêserojê, planên wan ji bo xwendina li zanîngehê... Dema ku ez li mala wan û li gel malbatên wan bûm mêvan, min dît ku ew bi dayik û bavê xwe re bi kurdî diaxivin. Wan zimanê dayika min baş dizanî, min zimanê dayika wan nedizani. “Ya, bu geri zekalî Kürtler, Türkçe'yi düzgün konuşuyorlar.”** Ez ji wan “geri zekalî Kürtler”an “geri zekalî”tir bûm.

... Di 11'ê gulana 2019'an de ez hatim girtin û xistim girtîgeha Kepsutê. Ez bi “teror”ê anku “lêgerîna rêyên ber bi aş-tiyê ve di welatê xwe de” hatim sûcdar kirin. Yekî ji hevalên min ên qawîşê ku digot qey ez kurd im, bi min re bi kurdî peyivî. Min tu tişt fêm nekir. Hingê min biryar da û demsaleke nû li Colemêrgê dest pê kir.

* Li Colemêrgê Demsalek

** Ev kurdên ehmeq rast û durist nikarin bi tirkî biaxivin.

Dîrok û çîroka navê Amedê 2

Amed Çeko Jiyan

“AMIDA”ya bi latîni

Wekî tê zanîn, delîla ji bo navê “Amîd/Amîda”yê tê pêşkêşkirin çavkaniyên Romayê ne. Tê gotin ku dewleta Romayê pereyêkî li ser “Amîd” nivîsandî çap kiriye û her wisa dîrok-nivîsê romayî yê ji Antaqayê Ammius Marcellinus (330-391 P.Z.) di pirtûka xwe de navê bajêr wekî “AMIDA” nivîsandiyê.

Lê gelo “i”ya “Amida”yê bi zimanê latîni wekî “i”ya tirkî û “î”ya kurdî tê xwendin? Di encama kurtelêkolînekê de, ez hîn bûm ku nivîsandin û bilêvkirina latîni di nav salan de guheriye. Çavkaniyên li ser înternetê behsa du awayên bilêvkirin/telefuzê dikin: *Classical* û *Ecclesiastical*. Ango ya *klasîk* û ya *dêr*.

Bilêvkirina latîni berê bi “awayê klasîk” bûye lê paşê di serdema navîn de bi bandora dêrê “awayê Ecclesiastical” jî peyda bûye. Îcar di dema Ammius Marcellinus de awayê klasîk hebûye. Wekî di vê vidyoya Youtubeyê de ku xwendina alfabe ya latîni li gorî bilêvkirina klasîk fêr dike, “i” ne wekî “î” lê zêdetir nêzîkî “ê”yê bûye.



(Hûn dikarin berê kameraya telefona xwe bidin vê koda QR'ê û ji devê mamosteyêkî zimanê latîni xwendina tîpa “i”yê di zimanê latîni de bibihîzin.)

Li gorî vî agahiyê, di dema Ammius Marcellinus de “Amida” bi bilêvkirineke nêzîkî “Amêda”yê hatiye xwendin lê piştî serdema navîn, wekî gelek peyvên latîni xwendina “Amêda”yê jî guheriye û êdî wekî “Amîda” hatiye xwendin. Ev jî nîşan dide ku dîroka navê “Amîda”yê ji serdema navîn dest pê dike.

Guherîna Amed û Amîdayê dişibe guherîna Diyarbakir û Diyarbakirê. (Wekî niha di nav gel de dibêjin “Diyarbakir” lê dewleta rom ya îro navê “Diyarbakir” bi kar tîne.)

Şûrê Adad Nirariyê 1'ê



Piştî pûçkirina îdiaya kevnariya “Amîda”yê dixwazim behsa îdiaya din bikim ku dibêjin, “li ser şûrê Adad Nirariyê 1'ê (1307 – 1275 B.Z.) Amid” nivîsandiyê. Di weşaneke “Metropolitan Museum of Art New York”ê de (Prun-

dence O. Harper, Evelyn Klengel-Brandt, Joan Aruz, Kim Benzel, (1995), Discoveries of at Ashur on the Tigris Assyrian Origins, r. 119) û di hin çavkaniyên din de, behsa nivîs û bermahi-yên serdema Adad Nirariyê 1'ê tê kirin. Li gorî çavkaniyan, ji dema Adad Nirariyê 1'ê gelek nivîs û her wiha şûrêk û serê bivirekî gihîştine roja me. Şûr li New Yorkê li “The Metropolitan Museum of Art”ê ye. Li gorî agahiya li ser malpera muzeyê, nivîsa li ser şûrî wiha ye: *Palace of Adad-nirari, king of the universe, son of Arik-den-ili, king of Assyria, son of Enlil-nirari, king of Assyria. (Milkê) qesra Adad-nārārī, şahê gerdûnê, kurê Arik-dîn-ili, şahê Asûr, kurê Enlil-nārārī (ku ew jî) şahê Asûr bû.* Wekî em dibînin, li ser şûrê wî navê “Amîd” nenivîsandiyê.

Bivir jî li Parisê li muzeya Louvre yê li Beşa Kevnareyên Rohilatî ye û li gorî agahiya li ser malpera muzeyê, li ser vî bivirî navê **Adad Nirariyê 1'ê** dinivîse.

Wekî din, di pirtûkên bi navên “*Assyrian Rulers of the Third and Second Millennia BC (to 1115 BC)*” û “*Ancient Records of Assyria and Babylonia*” de nivîsên ji dema Adad Nirariyê 1'ê mayî hene lê di van nivîsan de “Amid” nanivîse lê hin navên têkil-darî civak, bajar û deverên herêmê hene: Subarî, Taidî, Şurî, Kahat, Amasakî, Hurra, Şuduhî, Nabula, Waşşukanî, and Irridî, Kaşiyerî û Eluhat.

Îhtîmal heye ku Beysanoglu îdiaya xwe dispêre Lipînskî ku Lipînskî dibêje, dibe ku bajarê “Eluhat”ê ku di nivîseke ji serdema Adad Nirariyê 1'ê mayî de behsa wê tê kirin, navê kevn yê Amedê be. (Lipinski, (2000), Aramaeans: Ancient History, Culture, r. 153, 159–61.)

Lê “Eluhat” jî Amedê zêdetir navê “Êlih”ê tîne bîra mirov.


Nivîsên din yên ji serdema asûran

Her çend di belgeyên ji serdema Adad Nirariyê 1'ê mayî de navêkî ku em dikarin bêsîk bêjin “va ye navê bajêr ev bûye” tune ye, di belgeyên din yên ji serdemên hikumdarên din ên asûrî mayî de gelek caran behsa herêmê û bajêr heye. Di wan nivîsan de tê gotin ka wan kîjan dever û bajarên herêmê wêran kirine û wan li kîjan dever û bajarê wekî “artêşa DAİŞ'ê” serê mirovan jê kirine û bêguman li ba agahiyên li ser hovîtiya wan agahiyên li ser navên cografîk ên herêmê jî hene. Di wan nivîsan de navên wekî “welatê Madanî/Madanu”, “welatê Amadanî/Amadanu”, “bajarê Amedî/Amedu” hatine nivîsandin. (Tîpa dawiyê ya van navan (i) di wergera îngilîzî ya hin pirtûkan de wekî “u” di hinan de jî wekî “i” hatiye nivîandin.)

Wekî mînak, di nivîsên ji serdema Tukultî-Nînurtayê 1'ê (1244 – 1208) (neviyê Adad Nirariyê 1'ê yê xwediyê şûrê navdar) û di nivîsên ji dema Tiglat Pîleserê 1'ê (1244 – 1208) mayî de navê “**welatê Amadanî/Amadanu**” dinivîse. Di pirtûka bi navê “*The Routledge Handbook of the Peoples and*

Places of Ancient Western Asia” de ji bo vî navî ev agahî hene: **Amadanu (Madanu): Welatekî çiyayî yê Serdema Tûncê û Serdema Hesinî, li bakurê Mezopotamyayê, li bakurê rojavayê zincirçiyayên Kashiariyê yê bi navê modern Tur Abdîn.**

Wekî di vê ferhengê de dinivîse, ev herêm li bakurê rojavayê Tur Abdîn e. Hin îdiya hene ku “Amadanî” Çiyayê Qerejdaxê bûye û hin îdiya jî hene ku ne Qerejdax lê li bakurê Qerejdaxê bûye. Lê li gorî hemû texmîn û îdiyan ev devera di nivîsên asûran de behsa wê tê kirin derdora Ameda îro bûye.



Navê ku di wan nivîsan de navê herêmê bû, di nivîsên ji serdema Aşûrnasirpalê 2'yê (884 – 859 B.Z.) mayî de wekî navê bajarêkî derdikeve pêşiya me. Nivîsa ku di wêneyan de bi asûrî û îngilîzî xuya dibe, bi kurdî wisa ye:

from them, my own governor I appointed over them. From the pass of the mountain of Amadanî I went forth unto the city of Barzanisluhtun. Unto the city of Damdamussu, the stronghold of Ilani of Zamani, I drew nigh. I stormed the city; my warriors flew like birds against them. 600 of their fighting men I struck down with the sword, I cut off their heads. 400 men I took alive, 3,000 prisoners I brought out. That city I took for my own possession. The living men and the heads I carried to Ameli, his royal city. I made a pillar of stakes round about his city gate, the living men I impaled on stakes round about his city. I fought a battle within his city gate, I cut down his orchards. From the city of Amedî I departed. I entered the pass of the mountain of Kashiari (and) of the city of Allabrâ, wherein none among the kings, my fathers, had set foot, or had made an expedition thereto.

Min bajarên di navbera çiyayên Amadanî û Arqaniyayê de şewitan-din. Min welatê Mallanuyê yê li nav çiyayê Arqaniyayê xist bin kontrola xwe. Ez ji welatê Mallanuyê derketim û min bajarên welatê Zambayê şewitandin, ku li ser rîya min bûn. Piştî ez ji çemê Suayê derbas bûm, min li ber çemê Dicleyê kon vegirt. Min bajarên her du aliyên çemê Dicleyê yên li ser çiyayê Arkanîyayê kirin girên kaviil. Temamê welatê Habhuyê ji min tirsîyan û teslim bûn. Min xerc ji wan stand û min zilamekî xwe li ser serê wan wekî walî tayîn kir. Ez ji bora çiyayê Amadaniyê hatim bajarê Barzanîştunê. Min berê xwe da bajarê Damdamussayê, bajarê îlanuyê zîlamê Bît-Zamanî. Min bajêr dorpêç kir. Şervanên min li hemberî wan wekî çûkan firîyan. Min bi şûr 600 yekîneyên wan yên şer tek birin û min serê wan jê kir. Min 400 leşker zindî girtin. Min ji nav wan 3 hezar kes dîl girtin. Min ev bajar bi dest xist. Min leşkerên dîl û serên jêkirî birin bajarê Amediyê, bajarê wî yê qraliyê (paytext) û min li ber dergehê bajêr ji wan serîyan lod çêkir. Min leşkerên zindî li dora bajarê wî li qazoxan dan. Min li ber dergehê bajarê wî şerê wî kir û min baxçeyên wî talan kirin. Ez ji bajarê Amediyê derketim û li bajarê Allabsiyayê ketim bora çiyayê Kaşiyariyê ku ji nav bav û kalên min yên qral kes heta vê derê nehatibû. (A. Kirk Grayson, (2002) Assyrian Rulers of the Early First Millennium, Toronto, Weşanên Zanîngeha Torontoyê r. 220)

Wekî jî vî belgeya hovîti û komkujiyê xuya dibe, artêşa hov pêşî hatiye çiyayên Amadanî û Arqaniyayê, paşê li “Amedî/Amedu”yê û derdorê komkujiyê kiriye û çûye aliye çiyayê Kassiyariyê.

Di hemû çavkaniyan de tê diyarkirin ku çiyayê Kassiyariyê rêzeçiyayên Tur Abdînê ye û Arqaniya jî devera Erxeniya îro ye. Ango ev bajar di navbera Erxeniye û Mêrdînê de ye û wekî di nivîsê de hatiye diyarkirin, ev bajar paytexta Bêt-Zamaniyan e ku jixwe em dizanin paytexta wan Amed bûye.

Her wisa di pirtûka bi navê “*The Routledge Handbook of the Peoples and Places of Ancient Western Asia*” de di rûpela 38'an de wisa dinivîse: *Assyrian Amedu, Diyarbakir: Iron Age city in northern Mesopotamia on the right bank of the Tigris r., capital of the Aramaean state Bît-Zamani*. Bi kurdî: **Amedu, Diyarbakir: Bajarê serdema hesinî li bakurê Mezopotamyayê li rexê rastê yê çemê Dicleyê, paytexta dewleta aramî Bêt-Zamaniyan.**

Ev belge û delîl nîşan didin, navê vî herêma ku wekî welatê “Mîtanîyan/Medan” tê zanîn berê Med/Mad/Amad bûye û paşê ev nav bûye navê bajêr. (Wekî ku Diyarbakir pêşî navê herêmê bû û paşê bûye navê bajêr) Di encamê de xuya dibe ku ji berê ve navê bajêr Amed bûye, heta serdema navîn bi latîni jî wisa bûye lê piştî guherîna di zimanê latîni de navê bajêr êdî di belgeyên latîni de bûye “Amîda”. Divê em ji bîr nekin ku ev nav wekî navê “Diyarbakir”ê navekî fermî bûye ku tenê di qeydiyan de û li ser zimanê biyaniyan wisa bû. Loma di navbera “Amîda” û “Diyarbakir”ê de ti cudahî tune ye. Heçî “Diyarbakir” e, ew jî navlêkirina biyaniyan e û nikariye navê Amedê ku ji mîtanîyan maye bide jîbîrkirin.

Jêrnivîsên ji bo wêne û nexşeyan:

QRCode: (Hûn dikarin ji Youtubeê xwendina tîpa “i”yê di latîniya klasîk de bibihîzin:

<https://youtu.be/dTrHzdNW3BM?t=325>
Adad_Nirari_Shur_01: Şûrê Adad Nirari, <http://bit.ly/3rgJL2u>

Amadanî_Tikulta: A. Kirk Grayson, (1987) *Assyrian Rulers of the Third and Second Millennia BC (to 1115 BC)*, Toronto, Weşanên Zanîngeha

Torontoyê r. 252
Amedî_Asurî_Inglizî: A. Kirk Grayson, (2002) *Assyrian Rulers of the Early First Millenium*, Toronto, Weşanên Zanîngeha Torontoyê r. 220
Amedî_Inglizî: James Henry Breasted, *Ancient Records of Assyria and Babylonia*, The University of Chicago Press, New York, r. 168

Çavkanî:
Learn Latin with Kostas- Lesson 4 Short and Long Vowels, <https://youtu.be/dTrHzdNW3BM?t=320> Prudence O. Harper, Evelyn Klengel-Brandt, Joan Aruz, Kim Benzel, (1995), Discoveries of at Ashur on the Tigris Assyrian Origins, r. 119

Sickle sword, https://www.metmuseum.org/art/collection/search/322443?fbclid=IwAR2D_28_-OgdajjHdATpt2T0lqrzXyHxolVooY35dxUT119ns2Eokb2Dk

A. Kirk Grayson, (1987) Assyrian Rulers of the Third and Second Millennia BC (to 1115 BC), Toronto, Weşanên Zanîngeha Torontoyê r. 173

Hache inscrite au nom d'Adad Nirari I (1307 - 1275 avant J.-C.), http://cartelen.louvre.fr/cartelen/visite?srv=car_not_frame&idNotice=24897

Lipinski, (2000), Aramaeans: Ancient History, Culture, r. 153, 159–61.

A. Kirk Grayson, (1987) Assyrian Rulers of the Third and Second Millennia BC (to 1115 BC), Toronto, Weşanên Zanîngeha Torontoyê r. 236, 252, 292,

A. Kirk Grayson, (2002) Assyrian Rulers of the Early First Millenium, Toronto, Weşanên Zanîngeha Torontoyê r. 21

Trevor Bryce, (2009), The Routledge Handbook of the Peoples and Places of Ancient Western Asia, New York, Routledge, r. 34

A. Kirk Grayson, (2002) Assyrian Rulers of the Early First Millenium, Toronto, Weşanên Zanîngeha Torontoyê r. 220

Between the Musuku and the Arameans the Earlt History of Guzana/Tell Halaf, <https://core.ac.uk/download/pdf/227000222.pdf>, r. 298

‘Ömür Harmanşah, Source of the Tigris’. Event, place and performance in the Assyrian landscapes of the Early Iron Age, r. 189

[https://en.wikipedia.org/wiki/Amida_\(Mesopotamia\)](https://en.wikipedia.org/wiki/Amida_(Mesopotamia))



Jean Baptiste Bourguignon d'Anville (1794) Nexşeya Asyaya Biçûk di serdema antîk de, www.bit.ly/39EBCYT